

# DILNAME

6

1-5-2011

Rojnameyek Rewşenbîrî ye Serbixwe ye - [www.dilname.wordpress.com](http://www.dilname.wordpress.com)

## ROJNAMEGERIYA KURDÎ LI SÛRIYÊ

**Imer Kalo**

[imerkalo@yahoo.com](mailto:imerkalo@yahoo.com)

( Kobanî - Sûriya )



Dîrok û destpêkirina rojnamegeriya kurdî ya ku ji Sûriyê de derket; vedigere Gulana sala (1932) an, sala ku Mîr Celadet Bedirxan dest bi derxistina Kovara Hawar ê kir, lê carne hatiye gotin ku di pêş derketina Hawar ê de, rojnameyek bi navê Kurdistan li bajarê Helebê di sala (1915) an de derketibû, ji bo çespendina agahiyan li ser wê rojnameyê, ti jêder nînin, an jî min nedîtine. Ji derketina Hawar ê de ta roja me ya îro gellek rojname û kovar derketin û rawestiyên, hin jî berdewamin, her weha hin jî nû derdikevin.

Ji rojname û kovarên ku ji dîroka derketina Hawar ê de li Sûriyê-... **Dûmahîk Rûpel: 12**

## EHLAM MUSTEXANMÎ BERSIVÊN HILBIJARTÎ JI HIN HEVPEYVÎNAN\*

*(( ÇIYÊ NIVÎSKAR DIKANE BIBÊJE DI  
HINDIRÎ PIRTÛKÊ DE YE, NE DERVEYÎ  
WÊ YE ))*

Sibehekê ez rabûm min dît ku ez jineke bi mêr im û dayika sê kuran im û dektorek im û lêkolîvanek im di zanîna civakî de û pêjvanek im û cilşoyek im û anînerok im û dadokek im di hemû demjimêrên rojê de, min bêtir ji naznavêkî û ji pişeyekî hebû, lê min naznavê "helbestvan" der dabû (dorandibû). **Ehlam Mustexanmî**  
... **Dûmahîk Rûpel: 19**



## ROJHILATÊ ALMANYAYÊ Û ÇAND ( Beşê 2 )

Hejmara daniştvanên Erfurt, paytextê devera Thuringen ya li Rojhilatê Almanayê, 200 000 e. Ew bajarekî ji aliyê çandî û xweşikiya bîneyet û koşkan ve gellekî balkêş e. Du avahiyên mezin yê li ser girekî navenda bajêr dixin bin aliyekî xwe. Her du li kêleka hev in û her du jî avahiyên olî ne, lê ya mezintir kilîseyê kathêdralî\* ye û ya biçûktir kilîseyeke normal e.\* Ji wan wê de kelayeke li ser girekî din heye. Ji wir mirov- ... **Dûmahîk Rûpel: 3**



**Şahîne Bekirê Soreklî**

[shahinsorekli@hotmail.com](mailto:shahinsorekli@hotmail.com)

( Sydney - Australiya )

## DI 113 SALIYA ROJNAMEGERIYA KURDÎ DE

**Konê Reş**

[koneresh@hotmail.com](mailto:koneresh@hotmail.com)

( Qamişlo - Sûriya )




## MIQDAD MEDHET BEDIRXAN XWEDIYÊ BANGA NETEWÎ KURDÎ YE

Di baweriyê min de, eger Bedirxanî û Mîr Miqdad Medhet Bedirxan bi taybetî, ne xwediyên Banga Netewî Kurdî a 2'mîn bin, lê her ew xwediyên banga netewî Kurdî a 3'mîn in. Rast e helbestvanê Kurd Ehmedê Xanî bavê banga netewî kurdî a yekemîn e û wek ku hatiye- ... **Dûmahîk Rûpel: 10**

## MEM Û ZÎN BI KURDIYA ÎRO

Ji dema Ehmedê Xanî de heta destpêka sedsala bîstan zimanê kurdî yê nivîsandinê zêde nehatibû guhertin. Ji xwe herfên latînî hîn nehatibûn meydanê û her kurdekî (di çarçoveya kurmancî de) dikaribû Mem û Zînê bixwîne û kêr zêde jê fam bike. Lê piştî tevgera çandî ya ku li ser destê bedirxaniyan û xeyrî wan dest pê kir êdî hêdî hêdî kurd (hîn jî em di xelesa kurmanciyê de digerin) dûrî kilasîkên xwe çûn û her ku çû ji mîratê xwe yê wêjeyî qut bûn. Bi taybetî kurdên bakur ku tîkiliyên wan bi car de (ji bilî hin mele û feqeyên medreseyan) ji herfên erebî qut bûn. ... **Dûmahîk Rûpel: 8**



**Jan Dost**

[jandost@hotmail.com](mailto:jandost@hotmail.com)

[www.jandost.com](http://www.jandost.com)

( Almaniya )

## HAFIZÊ ŞÎRAZÎ, XOCEYÊ MELAYÊ CEZÎRÎ

Melayê Cezîrî ketiye bin bandora helbestvan û sofîyên Farisan û di hundurê helbestên xwe de navên wan diyarkiriyê, bi vî rengî sisê tînen naskirin: Hafizê Şîrazî û 'Ebd Errehmanê Camî û Se'dîyê Şîrazî. Di helbestek xwe de, Melayê Cezîrî ji ber hezkirina helbestên Hafizê Şîrazî çargoşeyek nivîsandiye û tev li helbestek Hafiz kiriyê, malik û niv-yek ya Melê ye û ((niv malik)) ya Hafize, Melayê Cezîrî dibêje:- ... **Dûmahîk Rûpel: 22**



**Xiyas Hisên**

[dillehi@yahoo.com](mailto:dillehi@yahoo.com)

( Kobanî - Sûriya )

## AMEDIM EZ



**Henîf Yûsuf**

hanifyoussef@hotmail.com

( Laydin - Holanda )

Bi evînim, bi birînim  
bi derdim ez,  
xemkedî me, xudî demim  
xudî çemim,  
Furate çemê min,  
Murate, Arase, Reşe, Sipî  
ye  
bilinde, navdare  
Zabe, Dicle ye,  
Xabûre,  
pir kûre çemê min.

Xudî zeman û çolim,  
delav û deşt û giya me  
xudî demsal û ba û baran  
û çiya me  
muhra sultan Silêman li  
sîngê mine  
ço yê Mûsa di destê mine  
diqelêşim rê ya xwe  
diçinim azadî ya we  
xudî birûsk û toz û axim  
xudî derd û doz û daxim  
stûrim weke dêw  
nazikim weke xewnên  
evîne  
maldarim, padişaha gula  
me  
padişaha kula me  
bilindim, dînim  
serê min  
li hawîra gulên çelmişine  
li hawîra gulên rû li kenin  
xudî mal û mewalim  
dem û dewranim  
Amedim ez....!

Ez bîr bûm, Usifê  
pêximber di min  
werkirin  
yanzdeh heyvim ez  
yanzdeh stêr û rojîm  
ciwanî ya min, giya yê şîne  
zarotî ya min, nêrgizên bi  
evîn bûn  
beybûna bi hêvî bû  
hêvî ya serî hildayî ber ve  
ezman bû,

pîrbûna min demên salê ne,  
lê çî bikim, ne payîze, ne  
bihare,  
ne havîne qayîle ye,  
ne zivistane har û dîne  
ne gorne ne zindane,  
ez bi xwe salim, demsalim  
sedsalim, hezarsalim  
ez pîr nabim her ciwanim  
ciwanî ya min navê mine  
hilma devê mine  
Amedim...!

Xudî dikim zarokan  
zarokên ku bi tava heyvê re  
dileyizin  
û bi tava rojê re têne kuştin  
bê deng û sedem.  
Xudî dikim xurtên bi gera  
cîhanê re  
digerin,  
bi derdim,  
bi derdekî reş û giranim  
biyanim, xumalim, firehim  
mezinim, bilindim  
pesna xwe didim,  
ji jînê re,  
ji mirinê rê,  
ji kuştî yan re,  
ji hiştî yan re,  
ji hostekar û pale û cotyaran  
re,  
ji dengbêj û textor û  
ristevanan re  
ez pesna xwe didim  
Amedim ez....!

Kevnarim, kevnewarim,  
nûgîhayî me,  
cefa ye navê min, derdê  
mezine  
min navê we li xwe kirî ye  
ji mine ku navê we tevan  
Amede  
ez ber dilê xwe avdikim, bi  
vê sawîrê  
bi va rastî ya li panzdeh  
kurk û hewranê we li xwe  
dikim  
sare, seqeme, bapeşka bê  
fedî ye  
ez jinim, kevanî me li ber  
mala mêran  
mêrên ku diherin palê li  
germa havînê  
diherin cejnê li ber devê  
biharê  
mêrên diherin mirinê û  
namirin  
ez bilindim  
kevanî ye mêrên bilindim  
ez qîzîm navê min  
Amede....!

Rûdinim li ser textê şevê  
weke heyvek zêrîn

şewqa xwe didim ser welatekî  
dirêj  
welatekî gulgulî  
guhdarî dengê azadî yê me  
xemilandî me  
weke bûkek sê rokî, tijî sawîr û  
nazikî û hêvî me  
Navê min heyve, Peyve  
Derde navê min, Merdexwene  
Kurde,  
rindbûna min bele ye li serê  
xurtan  
hêvî û miraze di dilê evîndarên  
stûr de  
Amedim ez....!

Amedxanim, bê dawî me ez  
paşela min tijî newale  
tijî nazdarî ya daxwaza ye  
her tişt li bîra mine  
her kes li bîra mine  
ez bîrim, ez bawerim  
hawarim, baranim  
baranim ez  
heçî yên tî vexwin ava min  
heçî yên westiyayî xwe bişon  
bi min  
zemzema we me  
hevdema we me  
Amedim....!

Ez dûr zemanim,  
navê min Amedxane  
ji malek xanedanim, ji mala  
kurda me  
ez veşarim, kevneşarim, azadî  
ya dîn û harim  
li çolan û siwêrekan ez xezal  
bûm  
min çêlikên xwe xudî dikirin,  
dimêjandin,  
bi bihara şêx Seîd re cîhan li  
serê min  
gerî, çêlikên min serjêkirin,  
ez asê bûm - kes nebîne - li  
ser sînorên  
dewletan,  
li min digêrîn diz  
nêçîra min dikirin  
Amedim....!

Va me ez  
careke din min xwe hilgirtî ye,  
diçim  
berve avezêyan  
ez avim, ez axim  
ba yê hêlî me,  
birûska bi şewq û tavim  
serê sibehê ez xunavim  
dileyzim bi dilovanî ya gulan re  
ze kanî me, avezê me  
cobaran û çemên dirêj xudî  
dikim  
Furat hefsare di destê min de  
ez dikşînim  
ava xwe berdidim ser sînoran

diqelêşim  
çiyar ava dikim, hostekarim  
ji xûdana xwe sûlavan bi rê  
dikim  
ez beybûnim, bêhna bihar û  
sibehê ji min tê  
xemla bûkan li mine  
rengînim, weke aleke bilind  
dibînim tê ye hildan li ser  
bejna min.

Ez dirêjim, bejin dirêjim  
kezî dirêjim  
gulî yên xwe li badikim serê  
sibê  
bîranînan dicivînim  
dixwazim dilê xwe hêdî  
bikim  
dileyzê di qefesa sîngê min  
de  
dikim nakim hêdî nabê  
rûnanê dilê minî kevir lêketî  
kute kuta xwe ye  
min didê ber nalînan, ber ax  
û  
keseran, weke derdekî  
giran

kevnarim, ez cengim  
bi cengan re hatime dinê  
canga bê dawî me  
şerê hebûn û hebûnê me  
ez şerim,  
şerekî têrî tijî me  
şerekî dirêjim weke azadî  
yê  
şerê heyvê bi ewran re me  
şerê xunavê û pinpinîkan  
bi sermê re me.

Ez hebûnim, şevim, tarî me  
ez  
weke kezî yên qîzan  
hunarî me weke rû yê  
zerîyên  
li ber mirazê xwe  
rengê hunê didim  
ez hune me li destê bûk û  
esmeran  
şewitî me, bê gunehim  
weke zarokên başûr  
dema mine ev  
dem her a mine  
xem her a mine  
ez xemim, ez derdim  
hêlî me ez bilindim  
bêlî me ez  
Amedim....!

Xewna li ber destê sibê me  
li ser piştê gê û mêsî me  
teşî ya xwe dirisim  
kevir kehnîkan ji şivanan re  
çêdikim  
tevnê li dardînim  
cilên mûrî çêdikim li ber  
sîka ... **Dûmahîk Rûpel: 3**

**AMEDIM EZ ... Dûmahîk:**

cobelê  
çavnêri ya mêvanên xwe dikim  
divê ku tidareke xwe bikim  
pirin mêvanên min  
ezê jê re rêxim cilên xetsor  
li ber lingên wan  
rojawa radibim, ji bo şîvekê çêkim  
ji mêvanên xwe re  
tevna min li dare  
her rojê dineqşînim aleke dirêj  
weke bejna azadî yê  
mêvanino, rêwîno, bilindino  
tevna min li dare  
dineqşînim ala xwe  
Amedim ez....!  
Ji mala mêra me, ji mala Şêxim  
ji mala Temirim  
ji mala nemirim  
qîza mala mezinim, mala kurda me  
zelalim ava Feratê kûrim  
dengê bayê hêlî me  
delalim, Hêveronim  
Gulzarim, Dîlberim  
Sînema ser bi dûmanim  
Xaca ser bi zêrim  
Keja xizem şorim  
Bêrîvanim, kenêra min bi şewçe  
Xezalim ez, xifşên min dileyzin  
li dora min  
karê xwe dikim  
weke felekê ji ya xwe namînim  
ez bangim, miletên derveder  
min bilind dikin  
hildidin tijî dengê xwe.  
Ez xewnim  
yar û neyaran ji xew radikim  
li nivê şevê  
rastî me ez, xwe dikim  
pêneke dilovan, dikevim  
hembêza candarên ku çiya  
tijî kirine bi jiyaneke fireh  
weke dilê nemiran.  
Dîlbera Faqî yê Teyranim  
cejnim, şahbûnekim, seyranim  
ez çira me pêketî me  
çira mala Tamirim, mala Badirxan  
û Şêxim  
çira mala we me  
zêrinim, bazinê destên qîzame  
zîv û cewahîrim, destikê xencera  
Cebelî yê mîrê Hekarî ya me  
ez Edûla paşa yê Milî me  
gulî biryayî me  
werin Delalino, ez gulî yên xwe  
ji hespên we re bi hefsar kim  
ez dîlokim di devê sazbandan de  
dîrokim di devê cîhanê de  
serpêhatî yen mezin ava dikim  
min binasin  
va me ez pesna xwe didim  
de bibhîzin  
Xwetûnim, Amedxanim  
Paytextim....!

**ROJHILATÊ ALMANYAYÊ Û ÇAND  
( Beşê 2 ) ... Dûmahîk:**

-tevahiya Erfurt li pêş xwe dibîne. Ji mirov  
ve baş aşkere dibe ku va bajara di demên  
par de çîqa dewlemend bûye. Dîroka wê ta  
1000 salên li par dikare bihêt şopandin. Ew  
di sal 1392 de bûye xwediya zanîngehekê.  
Kesên navdar di sedsalên derbas bûnê de li  
vî bajarî bûne. Bo nimûne: Martin Lührer li  
vî bajarî xwendina bilind bi seri kiriye û li  
wir wek keşe bo demekê di kar de bûye;  
malbata hunermend û afirmandê berhemên  
mûzîkî Bach demekê li vir maye, nivîskarên  
navdare yên wek Goethe û Schiller li bajêr  
bûne mêvan,.... Bajara di dîroka xwe de  
ketiye dest hêzên biyanî û di hinek  
qonaxên dîroka xwe de ji aliyê swêdiyan,  
fransiyan, hêzên amerîkî û dû re yên rûsî  
ve hatibûye birêvebirin. Ta dawîhatina DDR  
ew yek ji bajarên wê yên grîng bûye.

Wek bajarên din yên vê herêmê, hîn îroj jî  
bêhna DDR ji Erfurt dihêt. Kesê aliyên  
rojawa ji Almanyayê baş binase di cîh de di  
çav xwe re dike ku hem bajarên li rojhilat û  
hem daniştvanên wan ji yên li aliyên rojava  
cuda ne. Li dû yekbûna her du beşên  
Almanyayê reng li bajar û bajarokên van  
herêman vejeriyane, firoşgeh pirr û tiji  
bûne, xwaringehên corbicor zêde bûne...  
Lê dîsa jî hîn bêhna demên par ji van  
bajaran dihêt. Xwendekareke ji rojava, ku  
di zanîngeha Erfurt de dixwêne, dibêje me:  
"Xelkê vir nizanin bikenin." Li milê din, li vir,  
û dû re em dibînin ku her weha li Weimar,  
Dresden, Leipzig û şûnên din jî, gellek  
xaniyên vala hene. Li van şûnan nêrxê  
xaniyan gellekî ji deverên rojavayî arzantir  
e. Bêkariya li van herêman, li milê din,  
gellekî ji ya li herêmên rojavayî bilindtir e.

Nuha bi kêmasî hinek ji daniştvanên  
DDR'a berê xweziya xwe bi demên par  
dihînine. Gellek hevvelatîyên BRD'a berê,  
li milê din, ji xwe dipirsine: Gelo dê ne  
baştir bûya ku DDR (Almanya ya Rojhilat) li  
şûna xwe û BRD (Almanya ya Rojava) li  
şûna xwe bimana. Yekkirina her du beşên  
welêt gellekî buha bû ji bo Almanyaya  
Rojawa. Çîqa di nav salên çûnî de kar  
hatibe kirin û çîqa pêşveçûn li rojhilat hebe  
jî, hîn gellek sal divên ta ku ekonomiya wir  
xwe bigihîne radeya eknomiya li herêmên  
rojawa. Bandora siyaseta DDR û  
karbidestîya komonîste li gor modêla  
sovyêti ji 1945 ta 1990 domandî zûbizû ji  
holê ranabin. Hem ji aliyê xusetên mirovan  
ve û hem ji aliyê ekonomî ve hîn bi dehan  
sal divên ku Almanya û almanî rast wek  
yekgirtî bihên ber çav. Hevvelatîyên li  
deverên rojhilatî bi pirranî xweziya xwe bi  
demên di bin desthelatdariya DDR de  
nahînin, ew rewşa îroj baştir dibînin, lê di  
heman demê de pesna alîne erênî didin:  
Bêkarî di dema DDR de nebû, lêniherîna  
tenduristî bo her kesî misoger bû,  
xwepewerdekirin arzantir bû...

**HAWARA BIRÎNÊ****Fatma Savci**

fatma.savci@hotmail.com

( Stokholm - Swêd )



Qey dive di ber piştta her xeyala me de,  
şûrekî destik sor hebe?

Ev çend qirn in,  
em hilgirên xewnên kiras zêrîn in,  
bi biskên xwe yên badayî,  
uçkên xwe yên girêdayî  
gav bi gav na,  
mirin bi mirin,  
destên me li ser hewara birînê,  
bi çemekî rewa ve dilezînin...

Dêhnê xwe bidîyê,  
em li hêviyên kesk naşikînin,  
wan yek bi yek,  
wek sondeke nejbîrkirî,  
bi stuyê beza xwe ya xezalî ve  
dijîdînin...

Em dilên xwe yên tî  
bi xeyalên xwe yê rubarî hênik dikin,  
bêarê heyatê ne,  
berxwe nakevin,  
her carê,  
li xeyalên xwe yên gulîstanî diterpilin...

Tişt nabe,  
Bejna me qendîleke pêketî ye,  
li vî kendalî,  
bi giriyê dilobêjke gundê çiyayî  
û emrê pîrpîrikê re dibuhure...

Dilo!  
Ku nêrgiz vê berbangê li me nehilîn,  
û ezman bi rondikên xwe yên zelal,  
li ser pelên spîndaran,  
neynikeke zîvîn,  
ji ruyê me yên qemer re çênekin...  
loma neke,  
Naxwe vîjdan,  
dîlê kaniya helbesteke şaş e,  
û bizane,  
em di bin barana xwîna straneke kîndar  
de ne.

Li ser rihê zemên,  
ji qedera me re,  
ayetên hezar enfalan xwendine,

Na! qurbana te,  
hibra jana xwe tevî suretê reşbîniyê  
neke,  
noqî bîra radestîya mirinê nebe,  
li ber şemuka vî deriyê deryayê,  
xwîna çiyê ji min qut neke...



**QELEMZIRÎÇ****Sîpanî**

*sipani65@hotmail.com*

( Agirî - Turkiya )

Destê min da qelemzirîç  
der pela kaxizê wênê  
lê bi hêrs rast û çep dizivîrînim  
ji guvaştina tiliyan qêrîn a  
qelemzirîçê ye  
kaxiz serî danî ji serhildana  
qelemzirîçê.  
Bi qîr e qîr e qelemzirîç  
bi heşivker ( jêbir )ê ra  
qelemzirîç  
birî kirin çatme  
poz lê hilda  
çav kutayê  
tilî lê rakir  
û go:

Winda be ji ber çavê min

bes e nede pey min  
êdî şaşiya na kim  
va bi kurdî wêna xêz dikim.  
Nîgarvanê bêşka bexê xweyê  
Çerxî me  
xêlî ya Xecê çekê Siyabend  
rindî ya Zînê tenbulî ya Memê

bi kurdî xêz dikim.

Meydana Çarçira  
xençera Berzanî  
serhildana Şêx Seîd  
şoreşa Bedîuzeman  
berxwedana çiya yê Agirî  
bi kurdî xêz dikim

Çi bêjim


Feqî Mela Xanî

ji yekî bijmêr e heta ku tu  
dizanî  
kal û pîrê xwe bi kurdî xêz  
dikim

Hem ji

siyar dikim der û cîran  
bang dikim dost û heval  
jiyanê xêzkin bi kurdî  
bira pêşkeve perwerdî  
li benda qelemzirîçê bin

( 13.01. 2011 )

**VA ÎRO SER  
SALA ME!****Feqîr Ehmed**

*feqir1@googlemail.com*

( Almanya )

Va îro ser sala me  
Herin cem cîranê xwe  
Pîroz bikin bav û dê  
Bila maçikin çavên we

Bankin va hogirê xwe  
Agir dadin li nav xwe  
Cîhan bikin keskesor!  
Pîrozkin ser sala xwe

Def û zirnê lêxînin  
Govendê bi hevînin  
Dîlana keç û xortan  
Em roja xwe pîrozkin

Ser sala me roja sor  
Eme bibin hêz û dor  
Va dijminan derînin  
Ala rengîn hildin jor!

Roja Fekîr li nav gulan  
Bidin Hev dest û milan  
Cîhan tev hev bibîsin  
Rizgar dibê Kurdistan

**ELÎŞÊR!**

Ey hevalê li  
Qoçgêrî  
Rojek ez çûm  
mala wî  
Keç, lawûk û jinê  
tev  
Bûne berpîrsîyarê  
wî!  
Tev şahdî û desb  
kenî  
Şiv û gitin bi xweşî  
Tevî hev  
dikenîyan  
Ew mala nê  
nekokî  
Jinê bankir jîna  
min  
Bersif da evîna  
min  
Keç û lawûk bi  
şadî  
Ew hatin himbêza  
min  
Zarîyên Zirîf û  
Elîşêr  
Gîşkî bûne jin û  
mêr  
Feqîr Dibê hûn  
pîroz  
Pêşza dijmin bêne  
şêr

## ENSTÛTUYA KURDÎ YA AMEDÊ



Çavkanî:  
Elîxan Ioran

Enstîtuya Kurdî ya Amedê di reşemiya 2004'a li Amedê hatiye avakirin û dest bi xebatên xwe kiriye. Bi vebûna kursên zimanê kurdî re ji raya giştî re hatiye diyarkirin. Ji wê rojê vir ve li ser ziman û wêjeya kurdî xebatên xwe didomîne. Serokê enstîtuyê heta 2006'a Nesip Gültekin bû. Jê bişûn de Ebûbekîr Çelebî bû. Piştî civîna giştî ya dawîn biryara ji nû ve birêxistinê hate girtin û Enstîtu wekî Lijneya Rêveberiyê xwe birêxistin kiriye.

### Çalakiyên Enstîtuyê:

Heta niha çendek panel û atolyeyên ziman ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Amedê ve hatine lidarxistinê. Di sermaweza 2005'a de bi hevkarîya şaredariya bajarê mezin a Amedê bi tevîbûna pispore û zimanzanên kurdî yê her hêlên cihanê Konferansa Standartkirina Zimanê Kurdî hatiye lidarxistin. Encamên wê konferansê wekî pirtûk hatine weşandin.

### Organa Enstîtuyê:

Ji gulana 2007'a şûn de Kovara W ketiye bin banê Enstîtuya Kurdî ya Amedê, wekî weşana Enstîtuyê di riya weşangeriyê de jiyana xwe didomîne.

### Xebata berhevkarîya zargotinê û berhemên wêjeya klasîk a Enstîtuyê:

**1- Destpêk:** Li her herêmekê, li her bajarekî, li her navçeyekê, li her gundekî, li her newalekê, li her geliyekî, di her şikeftê de, li ser her kaniyekê, di binê her kevirê de, di her malekê de, di bîra her mirovekî de zimanekî, dirokekê, çavkaniyê civakê heye. Di bin axa vî welatî de gencîneyeke dirokî, zimanî û çandî û zargotinî heye. Li ser her bihustêke vê erdnîgariyê çavkaniyek heye. Her kesekî kurd hem delîl û hem jî şahidê vê çavkaniyê ye. Çima em xwe negihîjînin van çavkaniyan û em têr û tije xwe xwedî nekin? Qad qada me ye, çavkanî li ber me ne û em çima ne amade ne? Destpêkeke baş encameke baş bi xwe re tîne û fermoyê, em dest pê bikin.

**2- Armanc:** Berhevkarîna berhemên zargotinê û wêjeya devkî ya gel: Destan, Çîrok, Xeberoşk, Pêkenok, Gotinên pêşyan, Biwêj, Tiştanok / mamik û hwd.

Berhevkarîna berhemên nivîskî yê kevn û yê wêjeya klasîk: Dîwan, Helbest, Destnivîs, Pirtûkên kevnare û hwd.

**3- Rêbaz:** Berhevkarîya bi hevdîtînen rûbirû, Berhevkarîya bi amûrên deng-girtinê, dîmêngirtinê û nîşegirtinê, Bi rêbaza diroka devkî.

**4- Pêvajoyê:** Pêvajoya demdirêj 5 sal e.

**5- Atolyeya zargotinê:** Amadekirina bingehên xebata atolyeyê, 5 roj perwerdehî, Roja 6'an panela bi navê "Di bîra her kurdekî/ê de ziman, çand û dirok veşartiyê". Diyarîkirina 15 beşaran. Diyarîkirina cî. Temînkirin û amadekirina finansmanê, lêçûnên xwarin û vexwarinê, Encamên xebata atolyeyê: Di encama xebata atolyeyê de dê beşdarname bê dayîn. Bi taybetî ji bo xebatên bi vî rengî yê Enstîtuya Kurdî ya Amedê dê destûrname bê dayîn.

### 6- Xebata berhevkarîyê:

Berhevkarîya zargotinê: Kêm zêde 50 jin û mêrên çîrokbêj ku temenê wan ji 65 salî mezintir e çavkaniya berhevkarîyê ne. Hemû hevdîtîni bi sê awayî dê bêne qeydkirin. Kamera. Wênekêş. Amûra deng-girtinê. Pênûs û perawî.

Berhevkarîya ango kesê ku hevdîtîne pêk bîne ew ê bi tevahî li gorî rê û rêçikên berhevkarîyê tev bigere û nîşeyên ku girtine, wêneyên ku kişandine û bi kamerayê dîmenên ku kişandine wekî 3 kopye tomar bike û radestê kordînatîyê xebatê bike.

Hemû hevdîtîni dê li ser destûra kes û malbata çîrokbêjan be û dê zelal û vekirî be. Tercîha me li ciyê ku çîrokbêj dijî hevdîtîni pêk bê; lê ku derfet tune bin dibe ku çîrokbêj bê anîni ciyêke guncaw jî.

Di nava xebata berhevkarîyê de zêdeyê pirsên pêwîst û di derveyê mijarê de bi tu awayî berhevkarîya pirs û axaftinên cûda bi çîrokbêj re nake.

Berhevkarîya ku di derveyê rêgez û rêzikên de tev bigerin, yê ku bêamûr û bêpergal xebatê bimeşînin xebatên wan dê neyên qebûlîkirin.

Berhevkarîya çavkaniyên wêjeya klasîk ya nivîskî: Bi hemû seyda û melayên ku li herêmekê ne re hevdîtîni.

Çavkaniyên ku li cem wan hebin dê bi temînatên bêne wergirtin û bi 3 awayan bêne arşîvkirin.

Li ser bidestxistin û kevnbûn û naveroka berhemên dê hevdîtîni bêne kirin û bêne qeydkirin.

Berhemên dê bêne kopîkirin û dîsa li xwediyê wan bêne vegerandin.

Destûra mafên li ser berhemên ji xwediyê wan dê bê standin.

Berhemên ku bêne berhevkarîni dê wekî 3 kopye bêne arşîvkirin.

Tasnîfa berhemên dê bê kirin û di nava xebatên wêjeya klasîk de dê bibin mijara lêkolînê. Dem û demsala karê berhevkarîyê: Xebata berhevkarîyê di her demên salê de dibe. Piştî xebata atolyeyê hemû beşdarên xebata atolyeyê dikarin bi domdarî vî karî bimeşînin. Bi taybetî demsala zivistanê ji bo karê berhevkarîyê guncawtir e.

Xebata Atolyeyê di navbera 20 û 25'ê Tîrmeha 2009'an de pêk hat û beşdarname hatin dayîn.

### Pirtûk û weşînekên Enstîtuya Kurdî ya Amedê:

Enstîtuya Kurdî ya Amedê digel xebatên akademîk yê li ser ziman, wêjê, çand û hûnera Kurdî weşangeriyê jî dike. Heta niha curbecur 12 pirtûk û du hejmaran bultena bi navê Ziman ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Amedê ve hatine weşandin.

-Ziman Hejmar 1: Di Pûşpera 2005'an de hatiye weşandin. Hejmar 2: Di Reşemiya 2006'an de hatiye weşandin.

-Ji Zargotina Kurdî Çîrokên Gelêrî Huso û Nazê: Kewçêr 2004

-Ji Zargotina Kurdî Pêkenokên Kurdî: Kewçêr 2004

-Hunera Axaftina Xweş û Nivîsandina Rind: Tîrmeh 2005

-Toz Begê Req Req Paşa: Sermawez 2005

-Mîr Bedirxan: Tîrmeh 2005

-Feheng-Herêma Qerecdaxê û Hoza Kejan: Tîrmeh 2005

-Nav Di Zimanê Kurdî De (Kurmanciya Jorîn): Kewçêr 2006

-Cînav Di Zimanê Kurdî De (Kurmanciya Jorîn): Kewçêr 2006

-Dastana Gilgamêş: Kewçêr 2006

-Çîrokên Mala Zalê: Sermawez 2006

-Ji Denbêj Fadiîlê Kufraqî Destan û Çîrokên Kurdî: Avrêl 2007

-Mewlîdo Dimilî (Zazakî): Pûşper 2007

-Kulîlkên Baxê Botan: Gulan 2008

-Rêzimana Kurmancî: Berfanbar 2008

-Çil Çarîn: Berfanbar 2008

-Herdemciwanê: Reşemî 2009

-Matematîk: Berfanbar 2008

-Gayê Cot: Pûşper 2009

-Pîrê û Dîk: Pûşper 2009

-Rovî û Şêr: Pûşper 2009

-Herdemciwanê: Pûşper 2009

-Pîrê û Rovî: Pûşper 2009

-Di Sedsala 20'an De Kurdistan û Sînor -I-: Rezber 2009

-Fotografîyên Kulp/Pasûr: Rezber 2009

-Zimanê Kurdî: Rezber 2009

-Fehengî Kurdistan: Adar 2010

-Fehenga Aboriyê: Adar 2010

**HÊDÎ HÊDÎ****Ronî Elî**

dilekurd@hotmail.com

( Heleb - Sûriya )

**Hêdî hêdî**

Dostê mino hêdî hêdî ...  
 Di kevanê dilê min de  
 Rima poşmaniyê  
 Bi destê rahêner û filebazan  
 Şiyar neke  
 Bi nîrxê têkçûnê  
 Giyanê min  
 Di rûdawên bihûrî de  
 Gunehkar û tawenbar neke  
 Bi egera tolvedanê  
 Meremên kînan  
 Di şewata cerga min de  
 Encam neke  
 Hêdî hêdî ...  
 Çimkî ...  
 Sungiyên tolayan  
 Di tengala sosinan de  
 Buhar şewitan din  
 Rêberiya qeşmerokan  
 Di serbaziya dîlanê de  
 Govend şerpeze kir  
 Hêdî hêdî  
 Dostê mino hêdî hêdî ...  
 Dara kurm lê ketî  
 Di temenê min de  
 Ne afrîne .. neçespîne  
 Çîrokên ber kozîyan  
 Bi zimanê min

Belav neke .. neweşîne  
 Qirana pesindanê  
 Di boçûnên min de  
 Geş neke .. nepejrîne  
 Bi zimanê kostek kirî  
 Ber dadgehê  
 Min nekşîne .. ranekşîne  
 Hêdî hêdî ...  
 Çimkî ...

Binavkirina kêşeyan  
 Rûxwandina şîyan û omîda ne ..!  
 Bilêvkirina nerînan  
 Dabiryana mizmiza debenga ne ..!  
 Venasîna rasteqînan  
 Jîrkirina dijber û rikbera ne ..!

Hêdî hêdî  
 Dostê mino hêdî hêdî ...

Baranên payîzê  
 Di qurmên miçiqî de  
 Nîşanên buhara nadin  
 Şop û rêçikên têvel  
 Bi hêvî û lavlavan  
 Rûyê rastiyê nabin  
 Bejnên lawaz û şikestî  
 Bi qijqij û qêrînan  
 Deskewtinan hilnagrîn  
 Pût û peykerên gewre  
 Li ser çavên birçîyan  
 Tu ezmûnan sernaxin  
 Hêdî hêdî ...  
 Çimkî ...

Lêvên bi ramûsanên hingavtî  
 Dev ji dilçûnê nabin  
 Geliyên ji qirêjê pêngavtî  
 Tu çiçekan bel nakin  
 Ew dara kurm lê ketî  
 Sînga şalûr şanakin  
 Hêdî hêdî  
 Dostê mino hêdî hêdî ...

1/6/2010

**ŞIROVEKIRIN****A NAMEYEKÊ**

Di kembera keçeke avis,  
 Vehsana çîmena  
 têkoşerekî

Û weçana leşgerekî bê  
 weçan de

Hozan radibûn ser piyan

Pênûsan

Dîroka serkeftinan

Ji nîfşên nexwendî re

Ji kilê çavan

Û nanê tisî

Li ser pişta tîremarekî

Zikê kendalekî

Dihûnandin û diraçandin

Di hembêza welatekî lal,

Pîremêrekî qefilî

Û maleke wêrankirî de

Mamikên şevbêrkan

Di tevna rewşenbîrekî  
 zîrek de

Sirûdên pêşketinê

Di gul û beybûnan de

Bi ser awatên dewkîlan,

Ahînen bêzar

Û xwînpestan

Direşandin .. ned  
 weşandin

Gengeşeyên ber  
 dîwaran  
 Di pirtûkeke bê naverok,  
 Şevengên lezgînok  
 Û zerikeke berovacî de  
 Doza serbestiya jinan  
 Ji maçik û gezikên mêrê  
 hovber  
 Bi erkên mirovantiyê  
 Di goreke şareza,  
 Kavlekî bê nav  
 Û deriyekê bê binî de  
 Rave û şirove dikin  
 Di argûna mezobotamya  
 de  
 Sinîlên bav wendayî  
 Di deriyê çayxanan de  
 Gustîlkên re berdayî  
 Di tûrikê penaberan de  
 Civîna evînekê  
 Di pirojeyên civaka sivîl  
 de  
 Bo vejîne li dardixin  
 Da me tevan  
 Serbaz û serdar bixin

3/6/2010

## NAMEYEK JI SIRGÛNISTANÊ



Mehmûd Derwîş

Wergerandin ji 'Erebî:

Fadil Temo

- 1 -

Silavek.. û ramûsanek  
 Û tiştêkî min tineye  
 Ez bibêjim paşê  
 Ji ku de  
 Ez destpê bikim?  
 Û li ku biqedim?  
 Û çerxa demê bê sînore  
 Û her çiyê di bîyaniya min de  
 Buxçikeke, nanekî 'îşk tê de ye, û  
 bêriyek  
 Û lînûskeke  
 Radike ji ber min ve  
 Hinek ji yê min rakir  
 Min tû kir rûpelên wê  
 Çiyê ku bi min teng bû ji zikreşiyê  
 Ji ku de  
 ez destpê bikim?  
 Û her çiyê ku hatî gotin û  
 Yê tê gotin piştî sibakê  
 Naqede bi himêzkirinekê ... yan  
 pelandineke ji destêkî  
 Bîyên venagerîne malan  
 Nabarîne baranan  
 Dernaxîne perikan  
 Li ser baskê  
 Balindeyekî wendayî..hatîxwar  
 Ji ku de  
 ez destpê bikim?  
 Silavek .. û ramûsanek .. û paşê ..

- 2 -

Ji radyo re ez dibêjim..  
 Jê re bibêje ez baş im  
 Ji çivîkê re dibêjim  
 Ku tu lê rast hatî ey balinde  
 Ji bîr neke, û bêje baş im  
 Ez baş im  
 Ez baş im  
 Hîn di çavên min de  
 Heye ronahiyek!  
 Hîn di ezmên de

Heye heyvek!  
 Û kincê min yê kevnar,  
 Ta niha, nemiriye  
 Kêlekên wî qetiyan  
 Lê min ew perispan kir..  
 Û ew hîn baş e  
 Û ez bûm xortekî  
 Bîst sal derbaskirî  
 Min nîgaş bike .. ez ketim bîstan  
 Û ez wek xortan dayê  
 Rarûyî jiyane tîm  
 Bêr hildigirim  
 Weku peya hildigirin  
 Û kêr dikim  
 Di çêstxaneyekê de .. û çenaxan dişom  
 Û qehweyê ji kiriyê re çê dikim  
 Û girmijînan  
 Bi ser rûyî xwe yê xemgîn de  
 diçespînim  
 Ta kiryar dilşad bibe

- 3 -

Ez baş im  
 Temenê min kete bîst salan  
 Û ez wek xortan dayê  
 Tûtîne dikşînim, û pala xwe  
 Didim dîwêr  
 Ji şîrîne re dibêjim: Ax  
 Weku her kes dibêje  
 (( Birano, çi qasî keçik xweş in  
 Nîgaş bikin  
 Çendî tehle jîyan  
 Bêyî wan .. tehle jîyan ))  
 Û hevriyê min got : (( nanek  
 Li ba we heye?  
 Ho Birano; çiyê buhayê mirov  
 Ku her şev .. birçî raze?))  
 Ez baş im  
 Ez baş im  
 Nanekî cê li ba min heye  
 Û qufeyeke biçûk ji sewzewatê

- 4 -

Min di radyo de bihîst  
 Silava awareyan.. ji awareyan re  
 Hemiyên gotin: em gî baş in  
 Ti kes ne xemgîn e ;  
 De çawaye rewşa bavê min?  
 Ma ne hîn wek berê, hez dike  
 Xwedê bibîr bîne  
 Û kuran .. û axê .. û  
 zeytûnan?  
 Û çawaye rewşa birayên  
 min?  
 Ma bûn mûçexwer ?  
 Rojekê min bihîst  
 Bavê min dibêje:  
 Ew hemû dê bibin mamoste..  
 Min bihîst ew dibêje:  
 (Ez birçî dibim  
 Ta pirtûkê ji wan re bikirim)  
 Ti kes di gundê min de

Tîpekê di gotarekê de ji hev venake  
 Û çawaye rewşa xwîşka ma  
 Ma mezin bû.. Û  
 Xwazgînine hatinê ?  
 Û çawaye rewşa dapîra min  
 Ma ne hîn wek berê  
 Li ber dêrî rûdine?  
 Bo me divê ..  
 Xêr .. û xortaniyê .. û padaşê!  
 Û çawaye rewşa mala me  
 Û estaneya dûz .. û argûn .. û  
 deriyan?  
 Min di radyo de bihîst  
 Nameyên awareyan.. ji awareyan re  
 Ew hemî baş in!  
 Lê ez xemgîn im ..  
 Dikin min bixwin guman  
 Radyo nûçeyek ji ba we nanî ..  
 Tevî xemgîn  
 Tevî xemgîn

- 5 -

Şev - dayê - gurekî birçî xwînrêj e  
 Vêdiçewirîne bîyên ku kude biçê ..  
 Û asoyan ji qeratiyan re vedîke  
 Û daristana Darebiyê hîn xwe tev li  
 bahozan dike  
 Me çi kir dayê?  
 Ta em du caran bimirin  
 Carekê em di jîyanê de dimirin  
 Û carekê em li mirinê dimirin!  
 Tu dizanî çi min ji girî dadigire?  
 Çê bû û ez şevêkê nexweş ketim ..  
 Û nexweşiyê laşê min anî xwar !  
 Dê êvar bibîr bîniye  
 Koçerekî hate vir .. û venegeriya  
 welêt?  
 Koçerekî bê qerqer mir?  
 Ey daristana Darebiyê!  
 Ma tu dê bibîr bîniye  
 Ku yê avêtin bin siya te ya xemgîn  
 - weke çi tiştêkî mirî - miroveke?  
 Ma tu dê bibîr bîniye ku ez mirovek  
 im  
 Û tu dê laşê min  
 Ji talana qirarkan biparêziye?  
 Dayê hey dayê.  
 Ji kê re min ev kaxez nivîsandin  
 Kîjan posteya diçe wan radikeye?  
 Riya bejahiyê û deryayan û asoyan  
 hate girtin  
 Û tu dayê  
 Û bavê min, û birayên min  
 Û xwedî, û heval ..  
 Belkî hûn zindîne  
 Belkî hûn mirîne  
 Belkî hûn weke min  
 Bê navnîşanekin  
 Çiyê buhayê mirov  
 Bê welatek  
 Bê alek  
 Û bêyî navnîşanek  
 Çiyê buhayê mirov?



## MEM Û ZÎN BI KURDIYA ÎRO

... Dûmahîk:

Pêşketina zimanê kurdî (kurmançî) û bizavên nivîsandina bi kurmançiya paqij ev qutbûn bêtir bi cih kir û êdî ew peyvên di berhemên kilasîk de ku nîşana ciwaniya wan berheman û şarezayî û hostetiya nivîskarên wan bûn, bûne kelem li ber fêmkirin û têgihîştina wan berheman mîna Dîwana Melayê Cizîrî û Mem û Zîna Ehmedê Xanî û xeyrî wan jî. Rewşenbîrên berê kême zêde herdu zimanên erebî û farisî dizanîbûn û ew berhem ji bo wan biyanî nedihatîn. Tê digihîştin û tu carî şirove, tefsîr yan wergerandina wan berheman ku niha ji bo me kilîtkirî û asê ne nedihatîn bîra wan! Mijara me teksta Mem û Zînê ye. Ev tekst jî ji cûreyê wan tekstên ku girtî ne û her kes niha tê nagihîje. Ji ber vê yekê pêwistiya şirovekirina vê tekstê hebû. Ya rast min ew bi erebî ji berî 15 salan de şirove kiribû û heta sala 2006an sê car li Şam û Beyrût û di hokê çap bûbû.

Dema weşanxaneyê Avestayê teklîfa min bi nivîsandina tefsîreke kurmançî ji Mem û Zînê re kir, ez kêfxweş bûm. Mîna ku ez li hêviya vê teklîfkirinê bim min bi lez dest avête şirovekirinê û ev barê giran da ser milê xwe. Di serî de min Mem û Zîn bi kurdiya îro lê bi peşan wergerand. Paşê ez lê hay bûm ku ji sedî nodê çêja Mem û Zînê û mûzîka wê ya xweş û rewan diçe. Min got ka hela ez biceribînim û bi helbestî wergerînim dê çawa bibel!! Çend malik çûn min dît ku êdî Mem û Zîn ji xweber bi zimanê me yê îro diherike û wa pê dihisiyam ku ez bi xwe Mem û Zînê dinivîsim wekî ku berê ev tekst nebe. Bi rastî jî min xwe mîna xwediyê vê Mem û Zîna li ber destê we hest kir. Hemû hêz û karîna xwe xiste vî karê zor û dijar. Ew ne karekî hêsan bû. Diviya bû ez rojê ne kême deh seetan li ser bixebitîm û di demeke naskirî de biqedînim. Bo min bû pêşberiyek bi demê re û bi helbestvaniya min a têkçûyî re. Erê ev kar ji gelek aliyan de zor bû lê tiştê ku alîkariya min kir û xebata min hêsan kir helbestvaniya min a kevn bû û jiyana min a bêtirî bîst salan bi Mem û Zînê re bû. Ev heye bîst sal ez teksta Mem û Zînê dixwînim û li ser dixebitîm, ji bo peyvên biyanî li dehê ferhengan vedigerim û bi dehan pirtûkan dixwînim da ku nêzikî bîr û bawerî û ferhenga Ehmedê Xanî bibim. Êdî min piraniya malikên Mem û Zînê ji ber kirin û min zanîbû her mailkek çî dibêje û wateyên peyvên biyanî tê de çî ne. Dema min ew werdigerande ser kurdiya îro ne hewce bû ez êdî zêde li ferhengan vegerim yan jî li ber gotinekê rawestim. Min bêtir giranî da ristina hevokan û lihevanîna kêş û qafiyeyan ku heta ji min hat ez nêzikî giyanê Xanî û teksta wî ya pîroz bûm.

Peyvên felsefî, yên tesewifê, yên stêrnasiyê, mentiqê û hîn gelekên din kelemî mezîna bûn li pêşiya min. Min nedixwest xayintiyê bi vê berhemê û xwediyê wê re bikim lê yek caran mecbûr dibûm ku teserrufê bikim û hema bi kêmanî wateya malikê bînim ziman.

Ji wergera xwe dê mînakekê bînim ku roniyê dihavêje ser şeweyê xebata min. Di malika 2510 an de Xanî dibêje:

Herçendî ji bo me esl û bîx in

Herçar-i ji bo me axîşix in

Di vir de Xanî behsa çar elemntên ku bingeha hebûnê ne dike. Yanî agir û av û ba û ax!! Ji bo van çar elemntan di ferhengên farisî de gotina Axşîg yan Axşîc heze ku Xanî ew bi formeke xerîb (Axşîx) bi kar aniyê. Min maneya axşîx naskiriyê lê eynî peyvê ne mumkin e-

-ku di wergera wê de yan di kurdiya îro de hebe. Min rabû tenê wateya peyvê derbasî wergera xwe kir û ev malik wisa nivîst:

Çar bingeh in bo me kok in herçar

Makên me ne, ax , ba, av û hem ar

Mînakeke din:

Di mailkên 1240-1241-1242 de ev termên tesewwufê tîn: Delalê Mutleq. Tecellî. Fanî. Baqî. Şuhûd.

Înkar-i biket delalê mutleq

îqrar-i biket bi sûretê heq

Farix ji teclîya celalê

qanî` bi tesewwira cemalê

Fanî bikitin ewê wicûdê

baqî bibitin bi vê şihûdê

Mixabin di dirêjîya dîroka me ya wêjeyî de alternatîv ji bo van term û peyvên wisa nehatine dîtin. Heta niha jî zimanzanên me li ser nexebitîne. Diviya bû ku ez van peyvên yan mîna wan bihêlim yan jî li şûna wan peyvên nû çê bikim. Lê bi awayekî ku ez ne bîr û baweriyên Xanî wînda bikim û ne jî wê lihevhatin û harmonî û mûzîk di pezvan de ji dest bibim ez xebitîm. Min ew gotinên ku destnîşanî wan kir şirovekirin ne ku li şûna wan peyvên nû çêkirin. Û ew hersê malik bi vî awayî hatin nivîsîn:

Ji windabûna mezin vegere

Bi xwedayê heq bibe bawere

Destvala ji heybeta Yezdanî

Razî be ew bi hizra ciwanî

Ew hebûna xwe tune ke yekcar

Bi ciwaniya te bibe jîndar

Û bi vî rengî bi hezaran mînak hene kesê ku bixwaze dikare wan bipê û lêkolînekê li ser binivîse.

Tiştê ku ez dixwazim bibêjim û pîr pêwist dibînim ew e ku Mem û Zîna ku min bi kurdiya îro amade kiriye hîç û bi tu rengî nakeve şûna Mem û Zîna Ehmedê Xanî, ango nabe alternatîv ji bo orijînalê. Teksta Mem û Zînê berî her tiştî ziman e. zimanê wê taybet e û pîroziyêke wê heye, helbet ne pîroziyêke dînî. Bi tu awayî nabe ku em bibêjin Ehmedê Xanî wisa dibêje û herin şiroveyekê bikin mînaka xwe.

Ev xebat ji bo ku Mem û Zîn bi hêsanî li ser ziman bigere û bîr û bawerî û hizrên Xanî zindî bimînin hatiye meydanê. Xebateke ku hêvî dikim dê bibe pireke xurt di navbera me kurdên îro û Ehmedê Xanî û berhema wî ya hêja de.

Jan Dost

Almanya 2007

- Ev pêşgotina Mem û Zîn bi kurdiya îro ye. Ku ji hêla Avesta ve derketiye.



## BIYANIYEKÎ DI KURDISTANÊ DE ÇI DÎTINE

**Herekol Azîzan**

( Celadet Bedirxan )

( 1893 - 1951 )



Nasekî min ji min re gotibû:

Ma te ha jê nîne, rojnamenivîsekî Ewrûpayî ko di kurdistanê de geriyaye bi rêbiwarî hatiye Şamê. Nasê min ev tişt ji min re gotibûn, lê cihê nivîsevanî şanî min nedabû. Paş ko min riya xwe bi çend mêvanxaneyên Şamê xistin min mêrikê xwe bi cih kir û xwe da naskirin.

- Hawar, ne? Belê wekî ez li Kurdistanê bûm hin welatiên we ji min re gotibûn ko di Sûriyê de kovarek bi vî navî derdikevit. Min gelek dil dikir wê bibînim. Min çend hejmarên Hawarê bi xwe re anîbûn. Min ew dane wî. Çavê xwe li wan gerand û gote min.

- Dilê te heye ji min hin tiştan li ser welatê xwe bipirsî ne? Hin tişt hene ko min jî divêt ji te bipirsim. Pirsiyariya te a pêşîn ne ew e ko min di Kurdistanê de çi dîtiye?

- Herê ew e

- Min tiştin welê dîtine ko ji te û ji wan pê ve ko rind nas dikin tirk çi ye tu kes, xasima peyayekî Ewrûpayî, nikare bawer bike. Herçî ko min dîtine bawer bike berî du hezar salî jî di dinyayê de çenedibûn.

- Hukûmeta Enqerê {Ankarayê} nahêle ko biyanî, nemaze rojnamenivîsek bikeve erdê Kurdistanê. Çawan bû ko te pêk anî û derbasî Kurdistanê bûyî?

- Xebera te ye, belê tu kesî nahêlin. Ne tenê biyaniyan xelkê cih jî bê destûra wezaretê daxiliyê nikarin derbasî welatê kurdan bibin. Lê berê ewilî min negotibû ko ez rojnamenivîs im, paşê hin hemşeriyên min hene ko ji mêj ve li wê derê ne. Bi destê wan lê dîsan bi hezar dişwaroyê derbasî welatê we bûme.

- Qederê şeş mehan di Kurdistanê de mam. Tu nizanî di nav wan şeş mehan de min çi ezab dîtine. Tenê ev çend bêjim ko di tirkan de ne tenê hisên mirovîni lê tu tişt nemane. Di dinyayê de tiştin hene ne tenê ji destê mirovan lê ji destê cenaweran jî dernakevit. Lê ji wan têt.

- Em di "...."nê de diman. Carna rê pê diket ji bajêr derdiketin, ber bi rojhilatê ve diçûn di nev gund û eşîran de digeriyan û vedigeriyan cihê xwe. Digel vê hindê ez neçûme heta welatê Serhedan û deşta Mûşê.

- Lê hevalên me ko doçûn ji me re digotin, zulma ko li wê derê dihate kirin ji zulma ko di pîş çavên me de dibû bêtir û xerabtir bû. Herçî ko min di Tirkîyê de dîtine tevda li deftera xwe nivîsandine. Gava ez vegerim herim welatê xwe herçî ko min di gera xwe de she kirine û dîtine di rojnaman û kitêban de belav bikim. Çend caran li me-

-qewimiye ko ji gundên ko me mêvanê wan bûn, jendirman peya didan hev û dibirin. Ew peyayên ha nema vedigeriyan. Rojekê min tiştêk dîtiye ko tu car ji bîr nakim. Em bi rê ve diçûn. Kurdekî kal jî emrê wî di navbera pence û şêstî de, pêş me ve dihat. Jendirmekî tirk, xortekî bîst salî, ji şiverêyekê li me derbû. Kalo bi kum û destmal bû. Di himbêza wî de zarokêkî du salî hebû. Jendirme xeberin ne qenc jê re gotin û dirêjî wî kir. Bi tajanekî li ruyê wî dixist. Ruyê kalo diriya sere zarokî şikiya. Kalo serê xwe hilda pêş û dixwest pê zarokê xwe biparêze. Dawî jendirme westiya û sekinî. Kalo serê hilda. Me digot digirî, kî biwa welê bigota. Ne, nedigirî. Ruyê xwe dabû ezmên, li jendirme dinihêrt û lê dikenî .... çi bêjim .... Gundek hebû pirê car em diçûnê. Di wî gundî de dostekî me hebû. Kurdekî sed û du salî. Nizanim çawan bû pêlekê em neçûbûn gundê xwe. Me bêriya dostê xwe kiribû. Sê çar heval me gotina xwe kiribû yek û em çûbûn ziyareta dostê xwe. Kalê me kalekî ser xwe bû, bi kep û dest, diranên wî hêj hebûn. Hertişt dixwar û hergav devkenok bû. Wê rojê dîsan bi dîtina me şa bûbû. Lê nikarîbû wek hergav ji cihê xwe rabe û derkeve pêşiya me. Dil dikir ko rabe lê lingên wî nikarîbûn laşê wî hilgirin. Lingên wî werimî bûn. Te digot qê piyê wî nepixandibûn. Me jê pirsî. Kalo biserhatiya xwe gilî kir:

- Berî panzdeh rojan jendirme hatibûn gundî. Sîleh didane hev. Sîleh li ku, dewletê sere kemilê me hemi sipartine nuqtê. Me cem xwe kêr jî nehiştine. Herçî xortên lewend, wan girêdan û bi xwe re birin. Ew nema vegeyriyan. Hûn jî dizanin xortinin welê venagerin. Dor giha min jî. Min got: Heyran nîne, qurban nîne. Guh nedan ez avêtim erdê, lingên min hildan û qederê pence ço li min xistin. Ji lingên min xwîn vedizikî. Ne xema wan bû. Dilê min borî, ez hiştim erdê û çûn. Ji hingê ve di nav cihan de bûm. Hêj duhî rabûme ser xwe. Lê hîn nikarim bi rê ve biçim. Li min megirin ko ji ber we ranebûme. Me jê pirsî ma çire ew çend li te xistin?

- Ji ber ko ez kurd im. Lê pir ne ajot bi çavê tirsê li dora xwe nihêrt û got:

- Ne, ne ez şaş bûm. Berê berê, ez kurd bûm. Niho ez tirk im. Di vî welatî de herkes tirk e. Reben hêj dîtirsî dibe ko ji me jî. Ma tiştêkî welê qet hatiye dîtî û bihîstin. Bi sed salên xwe kokimekî welê ko tu lome jê nabit û bi du salên xwe ên mayîn zarokêkî şîrmij. Çawan destê mirov li wan herduyan radibit. Ma ne bes e. Nizanim kîjanî bêjim. Welatekî welê ko destûra wan ev e. Hêdî be ez ji te re bi tirkî bêjim: " Turk en bûyûk millet, Turkiye de yaşar Turk, yok başkasi". Lê ewle be êdî Tirkîya nikarît bijît. Heke ez bêtirs van tiştan dibêjim ne bêsebeb e. Ez çûm Stenbulê jî min halê wan li wê derê jî dît. Xwe ew çend bilind kirine ko nema dikarin ser lingan bisekinin, divêt bikevin. Ji û paşê, ewî hin tişt ji min pirsîn û nik xwe nivîsandin. Me destên hev guvaşt û ji hev veqetiyan. Ji ber ko camêr bi xwe dil nedikir ko navê wî, niho bêti berder kirin ez wî veşartî digirim. Lê gava bi xwe di welatê xwe de bîrên xwe belav kirin hinge em ê wan bîran digel navê nivîsevanî biguhêzînin stunên Hawarê.

\* Ji kovara Hawar ê hijmar (19) hatiye girtin.

**DI 113 SALIYA ROJNAMEGERIYA KURDÎ DE**... **Dûmahîk:**

naskirin Hacî Qadirê Koyî yê duwemîn e, lê her Bedirxanî xwediyên wê qencyê ne, çiko Hacî Qadirê Koyî di bin bandora Bedirxaniyan de, li Stenbolê fêr û serwextî kurdewariya netewî bûye.

Mîr Miqdad Medhet Bedirxan kurê Mîrê Cizîra Botan, mîr Bedirxan e.

Mîr Bedirxan(1802-1868), yê ku di sala 1843 an de, di herêma Botan de mîrnişiyek ava kir, pere bi navê xwe deranîn û di bin navê **Peymana Pîroz** de kurd li dor xwe civandin û belav kir û got: **Dîn dînê Xwedê ye, em tev birayên hev in...** Û wiha biyaniyan di pesnê wî de gotin: **Bedirxan Edalet e û edalet Bedirxan e...** Di sala 1847 an de, Mîr Bedirxan û malbata xwe sirgûnî Stenbolê bûne, di pey re girava Kirîtê.. Li Stenbolê, Mîr Bedirxan tev zarok û neviyên xwe li dor xwe komkirine û ji wan re gotiye:

(.. *Ez di tirsim ku hûn di nav tirkan de zimanê xwe jibîr bikin, û ku we ziman jibîr kir, hûnê welatê Botan û Kurdistanê jibîr bikin. Tiştê ku min ji we divê; hûn di malên xwe de, bi zarok û zêçên xwe re, bi zimanê bav û kalan bi axifin, yê wa neke, ne kurê mine ..*)

Di çend salên dawî de, ji sirgûn û zivariya ku Mîr Bedirxan di girava Kirîtê de derbaskir, gelek çaran ji Sultan dixwest ku destûra wî bide bi vegere Cizîra Botan, warê bav û kalên wî, lê sultan ew rê nedayê.. Vêca, dawî, ji sultan xwest ku rêka çûna Şamê bidêyê, da ku her çend salên xwe yê dawîn li Şama şerîf bibe.

Şam jî, ji Kurdan re wek cihekî pîroz lê tê mîzandin, hem ji rex musulmantiya wê ve, hem jî ji rex xweşiya wê ve û wek ku di nav Kurdan de belave: (**Şama şerîf erda muqedes..**) û ji mêj ve dibêjin: (**Şam şekire welat jê şêrintir e**).

Mîr Bedirxan, bi dûv bajarê Cizîrê, Şam ji xwe re hilbijart û wek ku xwest, sultan rê dayê û mîr Bedirxan ji girava Kirît, bajarê bi navê (Qendiyê) hat Şamê.

Hingê gelek ji zarokên wî li Stanbolê û Şamê dijiyan û hin ji wan karbidestên mezin bûn, kurê wî Bedrî Başa wê hingê waliyê Horanê bû. Lê kurê wî Miqdad Medhet li Stenbolê xwendina xwe dikir..

Wiha Mîrê Mîran her çend salên xwe yê dawîn li Şamê derbaskirin, ta ku di rojekê de, ji sala 1868 an de çû ber dilovaniya Xwedê, hingî zarokî wî ew di rex gora şêx Xalidê Neqşebendî de veşartin, li taxa kurdan ya ku dikeve quntara Çiyayê Qasiyûn de, raserî Şamê.

Lê sebareti Mîr Miqdad Medhet Bedirxan, xwediyê rojnameya kurdî a dayik KURDISTAN, ta niha ne sala zayîna wî û ne sala wêfata wî diyar in. Di sala 1889 an de digel birayê xwe Emîn Alî, bavê Mîr Celadet û Dr. Kamîran, kar û barê xwe û serhildanekê kirin li herêma Tirabzûnê, lê mixabin bi wan re neçûye serî..

Di baweriya min de, weşana rojnameya Kurdistan û banga wî di hejmara pêşîn de, **3'mîn banga netewî kurdî ye**, piştî banga bavê netewa Kurdî şêx **Ehmedê Xanî: (1651-1707)**, yê ku bang Kurdan kiriye û gotiye:

*Ez mame di hikmeta Xwdê de, Kurmanc di dewleta dinê de  
Aya biçî wechî mane mehrûm, bilcumle ji bo çî bûne mehkûm?  
Ger dê hebiwa me itîfaqek, vêkra bikira me inqiyadek  
Rûm û ereb û ecem temamî, hemiyar ji me re dikir xulamî  
Tekmîl dikir me dîn û dewlet, tehsîl dikir me ilim û hikmet  
Temyîz dibûn ji hev meqalat, mimtaz dibûn xwedan kemalat..*

Her wiha helbestvanê kurd yê netewî **Hacî Qadirê koyî: (1815-1897)**, yê ku di 1815an de, li Kurdistanê Îraqê, bajarê Koyê çêbûye û li gelek bajarên Kurdistanê, bi dûv xwendinê de gerya ye, xwendiyê û melatî kiriye. Piştî salên 1850 î ji Kurdistanê derketiye û çûye Stenbolê. Li Stenbolê pêwendiyên wî bi kurdan re çêbûye. Bi taybetî bi malbata Mîr Bedirxan re. Mîr Bedirxan jî, ew wek mamoste ji bo zarokên xwe girtiye. Wiha Hacî Qadir bûye mamostê zarokên Mîr Bedirxan û ew nêzikî pîrsa kurdî bûye.

Di baweriya min de Hacî Qadir li mala Mîr Bedirxan bêtir serwextî pîrsa kurdî bûye û ji wan fêrî Kurdewariyê bûye. Nexasim dema ku ew yekemîn car Mem û Zîn a Ehmedê Xanî li mala Mîr Emîn Alî Bedirxan dibîne, dixwîne û felsefeya Ehmedê Xanî nas dike. Û wiha di bin bandora zarokên mîr Bedirxan û felsefeya Ehmedê Xanî de helbestên xwe yê netewî dihune.

Di helbestek xwe de aresteyî Kurdan wiha gotiye:

*Ta rêk nekewin qebîlî ekrad  
Her wa dibine xerabe abad!  
Enwa'î mîlel le gewre ta çûk  
Xemilîwe memalîkî wekû bûk  
Yek berg in û yek zuban û yek reng  
Bê xeybet û xeyb û 'ar û bê deng.*

Hacî Qadirê Koyî di 1897an de li Stenbolê miriye. Gora wî di gornistana Reqece-Ehmed de veşartî ye.

**MÎR MIQDAD MEDHET BEDIRXAN Û  
ROJNAMEYA KURDISTAN 1898:**

Di dawiya sala 1897an de **Mîr Miqdat Medhet Bedirxan** ji ber nexweşiyê çûye Qahîre û li wir rojnameyek bi navê KURDISTAN ji bo pêşketina Kurdan weşandiye, hejmara 1ê di 22ê nîsana 1898an de derçûye û hejmara dawîn (31) di 14ê nîsana 1902an de.

Bi tenê wî her (5) hejarên pêşîn derxistine, û naveroka her 5 hejmaran bi nivîsên wî dihatine xemilandin, di pey re birayê wî mîr Abdurêhman Berdirxan weşana rojnameya KURDISTAN berdwam kiriye, ta ku hejmarên wê bûne 31. Ango rojnameya Kurdistan (1898) Rojnameyeke 15 rojî bû, cihê weşandina wê ji hejmara 1-5an li Qahîra bû, xwediyê wê Mîr Miqdad Medhet Bedirxan bû, hejmarên mayî ji 6-31ê xwediyê wan Mîr Ebdirehman Bedirxan bû, birayê Mîr Miqdad, cihê weşandina wan ji 6-19 an li Cinêvê çap bûne; ji 20-23an jî careke din li Qahîra çap bûne; hejmara 24an li Londonê çap bûye; hejmarên 25-29 li Folkostonê û herdu hejmarên dawîn li Cinêvê çap bûne. Tev hejmar hatine dîtin ji bil hejmara 19 an, hêj ev hejmar nebediye.


Mîr Miqdad ji her hejmare 2000 nesxe, di rêka Şamê re dişandin Kurdistanê, bo Şêx, Mella û xwendevanan.

Mixabin ku di sala 1906'an de piştî kuştina Ridwan Paşa, Mîr Miqdad Medhet Bedirxan sirgûnê Mekkê bûye, û êdî ti pêzanî li dor nînin. Li xwarê çend deqên ku min ji gotarên wî bijartine:

Her wiha di hejmara (3)an de wiha gotiye:  
(*Gelî kurdino! Hun jî dest hilênin,- ... Dûmahîk Rûpel: 11*)



## DI 113 SALIYA ROJNAMEGERIYA KURDÎ DE ... Dûmahîk:



-bie'limin ilim û hunera da Xwedê Te'ala û resûl Ellah eleyihî elselam ji we razî be, da hun bikaribin, dîn û namûsa xwe ji şerê dijmina hefîz bikin, da hun jî bikaribin wetenên xwe de rûnin, da hun jî ji vê rênçberî yê xelas bibin. Ez gelek reda Kurda dibînim hemî jî rênçberin, jarin. Gelek ji wan, ji rebeniyê, ji feqîriyê, ji xerîbiyê ditelifin. Yek xweyî ilim û huner dikare pencsed mirova re şixila bibîne, loma hekî çendek ji mîr û axayên Kurda elimîn huner û ilmî, wê hingê kurd wê wetenê xwe de, ji xwe re şixula bibînin, wê ne mihtac bin, biçin ji derve zar û reben bin, rênçberiyê bikin..)

Rojnameya Kurdistan / 1898, hejmara(3), rûpelê(2), Qahîre.

Di hejmara 4 an de jî wiha gazî û hawarî Kurdan kiriye û gotîye:

(Gelî Mîr û Axano ! Kurmancho! qenc bizanin xwendin, ilm û merîfet (li) dinyayê û axretê rûyê mirov spî dike, mirov mihtacî tu nabe. Riya Xwedê de paş niho zaroyên xwe bie'limînin ilm û me'rifeta, hûn bi xulaqetê xwe şûca' û cesûrin, heke hûn bibin xweyî ilm, hûnê ji dinyayê hemîyan xurtir û dewlemendtir bin).

Rojnameya Kurdistan /1898, hejmara (4), rûpelê(3), Qahîre.

Bi helkeftin 113 saliya derçûna yekemîn rojnameya Kurdî bi Navê KURDISTAN li Qahîre ez cejna rojnamegeriya Kurdî li tev rojnamevan, nivîskar û helbestvanên Kurd pîroz dikim, bi taybetî ewên ku di ber peyva Kurdî de zext û zor dîtine. Û bi hêviya rojên xweş û geş ku nêzîk dibin.

( Qamişlo 22.04.2011 )

## JI PÎŞEYÊN KURDAN ÇÊKIRINA KULAVAN

Li ser zimanê:

**Hecî Bilal**

( Xalo )

( Kobanî - Sûriya )



Hecî Bilal ( Xalo ) di sala ( 1945 ) an de li gundê Til Şîrê - herêma Kobaniyê - Sûriyê ji dayik bûye, xwendina xwe ya navendî ta rêza nehan di sala ( 1964 ) an de li bajarê Kobanî xwendiyê, çar mehan li ber destên Cellatê Ermenî di sala (1964) an de hîni karê çêkirina Kulavan bûye, ji wê salê de ta sala ( 1988 ) an wek hosteyekî karê çêkirina kulavan li bajarê Kobanî karkiriyê. Hêjayî gotinê ye ku Xalo ji sala ( 1-1971 ) an de tevlî xebata Teverga Kurdî ya Siyasî li Sûriyê bûye û ta niha karê xwe yê siyasî berdewam dike, her weha ji bo pirsê gelê kurd ketiye zindanan û gellek ked pêşkêşkiriyê, ew yek ji rû û nimûyeyên mirovên dilpak û kurdperwer bi navê Xalo di nav tevgera kurdî de li herêma Kobaniyê navdare!.

### KULAV JI ÇI Û BI ÇI Û ÇAWA ÇÊDIBE?

#### 1- LIVA:

Kulav ji Liva ya ( Pirça ) Bexên şeşmehîn çêdibe, ji birça Bexan re dibêjin Liva, ji ya Pezê mezin re jî dibêjin Hirî. Sedema çêkirina Kulav ji Livayê: Ji ber rengê wê û nermî û nazikiya wê ye, ew baş û zû hevdiqre. Liva ya rengê reş an qer an sor jî (Baste) ji bo çînan ji Kulav re tê bikaraîn.

#### 2- ALAVÊN DESTAN YÊN JI BO ÇÊKIRINA KULAV:

- 1- **Esqîn:** Darekî Tû yê nerm e.  
- **Yayî:** Darekî di rengê kevanê de ye.  
- **Kirîş:** Roviya pez e ( Dewar ).

Kirîş bi herdu serên Yayî yê kevanî de dibe û tev bi serê Esqîn de dibin. Rol û karên her sêyan wek alavekê, ji bo jihevderxistin û jentina Livayê ye.

2- **Mekut:** Li Kirîşê dikeve, ji bo ku Livayê jihevbiqe.

3- **Cawbir:** Ji bo birîna çînan û qutkirina Liva ya zêde li dorhêla kulave.

4- **Pêçik:** Ji bo belavkirin û reşandina Livayê li ser çînan ( Bi zimanê Turkî: Sebkuşî ).

#### 3- RENGÊN KULAV:

- 1- **Kulavê 'Ecemî:** Çînen wî rengîn.  
2- **Kulavê Normal:** Çînen wî bêrengîn.

#### 4- QONAXÊN ÇÊKIRINA KULAV:

- 1- Li gor pîvana Kulav - çûkî û mezinî - çin bi rengên cuda li ser cawekî ku têra ser û binê Kulav dike tèn çêkirin.



- 2- Liva bi Pêçikê li ser çînan tê belavkirin.



- 3- Caw li ser Livayê tê girtin, li stûnekê tê gerandin û bi şeweyekî gulover tê topkirin û lihevbadan û bi benekî tê şidandin.

- 4- Bi lingan Kulav li erdê tê pêkirin û kutandin û teqlekirin.

- 5- Kulav tê vekirin ji bo teqlekirin û çêkirina dorhêlên wî bi rengê rast, Liva li cihên ku kêma xuya dibe tê zêdekirin. Ji vê qonaxê re dibêjin: Disûn.

- 6- Qonaxên ( 2 û 3 û 4 ) pênc caran tèn dúbarekirin.

- 7- Qonaxa dawiyê vekirina Kulav û temîzkirina wî bi destan ji her çar aliyên ku ser û binê wî de ye.



#### ALAVÊN MÎKANÎKÎ YÊN JI BO ÇÊKIRINA KULAV:

- 1- **Mendefe:** Ev alav bi rola Esqîn û Yayî û Kirîş radibe, ango ji bo jihevderxistin û jentina Livayê ye.


- 2- **Dellake:** Ev alav jî bi rola lingan radibe, ango ji bo kutandin û teqlekirinê.

Ev herdu alav jî li ser Eliktirîkê ( Kehrebê ) kardikin û dixebitin, Xalo ji sala ( 1976 ) an de bi wan karkiriyê.



**ROJNAMEGERIYA KURDÎ LI SÛRIYÊ ... Dûmahîk:**

-derketine, di van herdu listeyan de ne:

**1- ROJNAMEGERIYA RAWESTIYAYÎ**

**1- HAWAR:** Kovar, di Gulana sala (1932) an de ji aliyê Mîr Celadet Bedirxan ve derket, (57) hijmar jê derketin, di (15-6-1943) an de rawestiya.

**2- RONAHÎ:** Kovar, di (1-4-1942) an de ji aliyê Mîr Celadet Bedirxan ve derket, (28) hijmar jê derketin, di Avdara sala (1945) an de rawestiya.

**3- STÊR:** Kovar, di Avdara sala (1983) an de ji aliyê Partiya Hevgirtina Gelêrî ya Kurd li Sûriyê ve derket, (24) hijmar jê derketin, di sala (1994) an de rawestiya.

**4- XUNAV:** Kovar, di Tebaxa sala (1986) an de ji aliyê Partiya Demokrat ya Kurd li Sûriyê ve derket, (18) hijmar jê derketin, di sala (1995) an de rawestiya.

**5- GURZEK GUL:** Kovar, di Avdara sala (1989) an de ji aliyê Konê Reş û 'Ebdilbaqî El-huseynî ve derket, (15) hijmar jê derketin, di sala (1992) an de rawestiya.

**6- ZANÎN:** Kovar, di sala (1991) an de ji aliyê Ferhad Çelebî û 'Ebdilbaqî El-huseynî ve derket, (12) hijmar jê derketin, di sala (1997) an de rawestiya.

**7- HÊVÎ:** Rojname, di Tebaxa sala (1993) an de ji aliyê Behzad Resûl ve bi zimanên Kurdî û 'Erebî derket, (7) hijmar jê derketin, di sala (1994) an de rawestiya.

**8- DELAV:** Rojname, di Tebaxa sala (1995) an de ji aliyê hin rewşenbîran ve derket, (3) hijmar jê derketin, di sala (1996) an de rawestiya.

**9- REWŞENBÎR:** Rojname, di sala (1995) an de derket, (5) hijmar jê derketin, di sala (1997) an de rawestiya.

**10- XWENDEVAN:** Rojname, di sala (1997) an de ji aliyê xwendekarên zanîngehan ve bi zimanên Kurdî û 'Erebî derket, (13) hijmar jê derketin, di sala (2001) an de rawestiya.

**11- ZEVÎ:** Kovar, di Avdara sala (2001) an de ji aliyê Arşevê Oskan û Mihemed Îsa û Mîdasê Azîzî ve derket, (6) hijmar jê derketin, di sala (2002) an de rawestiya.

**12- BIHAR:** Kovar, di sala (1994) an de ji aliyê Hevbendiyê Demokrat ya Kurd li Sûriyê ve derket, (7) hijmar jê derketin, di sala (2002) an de rawestiya.

**13- HEVIND:** Kovar, di sala (2004) an de derket, (7) hijmar jê derketin, di sala (2006) an de rawestiya.

**14- VÎN:** Kovar, di sala (2006) an de hijmarek jê derket û rawestiya.

**15- HELEZ:** Kovar, di sala (2007) an de derket, (2) hijmar jê derketin, di sala (2007) an de rawestiya.

**16- SIBA:** Rojname, ji aliyê xwendekarên zanîngehan ve bi zimanên Kurdî û 'Erebî derket û rawestiya.

**2- ROJNAMEGERIYA BERDEWAM**

**1- GULÎSTAN:** Kovar, di Nîsana sala (1968) an de ji aliyê Seydayê Cegerxwîn ve derket, paşê ji aliyê Partiya Demokrat ya Pêşverû ya Kurd li Sûriyê ve berdewam bû, derdora (38) hijmaran jê derketiye.



**2- GELAWÊJ:** Kovar, ji sala (1979) an de ji aliyê Partiya Demokrat ya Kurd li Sûriyê (El-partî) ve derdikeve, derdora (33) hijmaran jê derketiye.

**3- PIRS:** Kovar, ji sala (1993) an de ji aliyê Partiya El-wehdê ya Demokrat ya Kurd li Sûriyê (Yekîfî) ve derdikeve, derdora (49) hijmaran jê derketiye.

**4- ROJ:** Kovar, ji sala (1991) an de ji aliyê Partiya Sosyalîst ya Sûriyê ve derdikeve, derdora (14) hijmaran jê derketiye.

**5- JÎN:** Kovar, ji aliyê rêxistina Şam ê ya Partiya Demokrat ya Kurd li Sûriyê (El-partî) ve derdikeve, derdora (110) hijmaran jê derketiye..

**6- ROJ:** Kovar, ji aliyê rêxistina Cezîrê ya Partiya Demokrat ya Kurd li Sûriyê (El-partî) ve derdikeve, derdora (100) hijmaran jê derketiye.

**7- AZADÎ:** Kovar, ji aliyê rêxistina Heleb ê ya Partiya Demokrat ya Kurd li Sûriyê (El-partî) ve derdikeve, derdora (40) hijmaran jê derketiye.

**8- ASO:** Kovar, ji sala (1992) an de ji aliyê Siyamend Ibrahim ve derdikeve, derdora (15) hijmaran jê derketiye.

**9- NEWROZ:** Belavok, ji Gulana sala (1995) an de ji aliyê Partiya El-wehdê ya Demokrat ya Kurd li Sûriyê (Yekîfî) ve derdikeve, derdora (96) hijmaran jê derketiye.

**10- DENG:** Belavok, di Tebaxa sala (1995) an de ji aliyê Partiya Hevgirtina Gelêrî ya Kurd li Sûriyê ve derket, paşê ji aliyê Partiya Azadî ya Kurd li Sûriyê ve berdewam bû, derdora (124) hijmaran jê derketiye.

**11- ROJDA:** Kovar, ji sala (1998) an de ji aliyê PKK ê ve derdikeve, derdora (20) hijmaran jê derketiye.

**12- PERWAN:** Kovar, ji sala (2001) an de bi zimanê Kurdî û 'Erebî ji aliyê Komîta Ciwanên Kurd li Sûriyê ve derdikeve, derdora (22) hijmaran jê derketiye.

**13- ZIMAN:** Belavok, ji Avdara sala (2004) an de ji aliyê Derwîşê Xalib ve derdikeve, derdora (35) hijmaran jê derketiye.

**14- ZAR:** Kovar, ji Avdara sala (2008) an de ji aliyê Komîta Fêrbûna Zimanê Kurdî ve derdikeve.

**15- YEKÎTÎ:** Belavok, ji Hizêrana sala (2008) an de ji aliyê Partiya Yekîfî ya Kurd li Sûriyê ve derdikeve, derdora (22) hijmaran jê derketiye.

**16- DÎMOQRATÎ:** Belavok, ji Êlûna sala (2008) an de ji aliyê Partiya Demokrat ya Pêşverû ya Kurd li Sûriyê ve derdikeve, derdora (30) hijmaran jê derketiye.

**17- DILNAME:** Rojname, ji (1-12-2010) an de ji aliyê Imer Kalo û hin rewşenbîran ve derdikeve, derdora (5) hijmaran jê derketiye.

Li dawiyê, hêvdikim ku min navê ti rojname û kovaran jibîr nekiribe, her weha ti agahiyên şaş û çewt pêşkêşnekiribin. Tevî ku min bi navê hin kovar û rojname yên din jî bihîstiye, lê ti jêderên ku min bikariba agahiyên durist jê wergirtana bi dest min neketin?. Dê lêgerîn li ser van rojname û kovaran berdewam bibe, ta ku agahiyên dîtir li ser wan werin zelalkirin. Yên ku karibin min li ser şaştiyan agehdar bikin, an hin agahiyên dîtir li ser rojnamegeriya kurdî li Sûriyê ji min re rêkin, eze pir spasiya wan bikim. ( Nîsan - 2011 )

## KARİKATUR



**Rêber Kalo**

reberkaloo@hotmail.com  
( Kobanî - Sûriya )



## JI GORISTANAN

### GORA

**Mihemed Se'îd Axayê Deqorî  
LI BAJARÊ AMÛDA  
( 1928 – 1960 )**



Ev gora Mihemed Se'îd Axayê Deqorî lib ajarê Amûdê ye. Şehîdê şewata sînemaya bajarê Amûdê. Di wê bûyerê de bi hawara zarokan ve çû û wî jî tev wan jiyana xwe ji dest da.

## HÊVIYÊN

### MERBENDKIRÎ



**Evdoyê Heseno**

evdoyeheseno@hotmail.com

( Kobanî - Sûriya )

Ez û te li ser lêvên tabloya vê

jiyanê

Du rengên lalin

Bê pergalin

Du peyvin

Ji şaristaniya hebûnê koçbarin

Em du kevokên reng spîne

Di ezmanê birînan de

Difirin ... dinalin

Nizam çima ... ?

Hêviyên me

Bi keziyên welatekî hejar ve

Girêdayî

Û bi sêpiya birakuhiyê ve

Darvedibin

Û tim li ser lêvên hedanek

birîndar

Em dest bi kîrîna


Rihela evîna xwe dikin.

## TABLO

**Kawa yê Hesinkar**



## ALA KAWA



### Ala Kawa:

Piştî serkeftina wî ser Zahak, Ferîdûn Kawa kir serleşkerê xwe û hukûmeta Esfehnan xist destê wî, û ala Kawa ( Derefşa Kawiyani ) ya azadî-xwaz li ser her deverê bilindkir.

Ev al ji bervaneka Kawa - ya ji çerm çêbûbû - hat peydakirin, paşê şahên Îranê ev al bi zêr û kevîrên pîroz xemilandin û li bal wan ma ta 'ereb ketin Îranê.



## ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN

Roman - Xelek ( 6 ) ©

**Pîr RUSTEM**

pir1963@gmail.com

( Efrîn - Sûriya )



- Ev dihêle ku, em careke din vegeerî ser pirsê berê; tu çima ji xwediyên xwe bi dûr ketî.

- Ez jî te vedigerînim bersiva çûyî; emê ewê çêrokê bihêlin rojeke din.

- Ne xeme, tu dipirsî; dê kes bi rewşa min razî bibe. Eger ku hezkirin hebe û tu karekî ji xwe re bibînî, dê çima keçik razî nebe.

- Em gihêştin tiştê ku, tê xwestin; ez ji karan heznakim, nikarim yekî di ser seriyê xwe re bibînim, dîtina wî dihêle civaka koletiyê û jiyana segan bête bîra min. Koçer çend caran bizavên xwe kirin ku, karekî ji xwe re bibîne û du-sê caran jî çûbû ser kar, lê ti carî jî bêtirî rojekê tede nedima û bêyî ku, vegere û pereyên ewê rojê bistîne, dev jê berdida.

- Bes tu yê ji ku buxî. Pirsê wê dilopeke xwînê ji dil dadirivîne û dihêle Şêrîn lêvên xwe gezke.

- Ez ne li dijî ku, yek kar bikê, me. Lê ez nikarim her karekî ji bikim û bawer neke ku, keçek dê hebe û bi rewşeke weke ya min razî bibe. Koçer hinekî gotina xwe nerm dike û bi Şêrînê re dadikeve lîska mişk û pisîkê.

- Çima na. Dilgermiya Şêrînê, dihêle pelê tiwiyê biweşe û paşî lê tazî bibe. Liva wê ya ser têxt jî kir ku, bermalka wê bêtir bi jor ve bikişe û heya bi kenara derpiyê sor bête xuyan.

Koçer û bi boneya tomarkerê radibe ser xwe, da ku karibe û ji ewî cihî ve, bi xweşkayî li nav rehên wê binire û Şêrîn jî, bi dûrxistina herdu rehên xwe ji hev, bêtir rê li ber wî vedike.

- Te ji berî kêlîkê got ku, temenê te hefde salî ye û tu rêza nihan dixwînî. Wî xwest bihna toxmiyê, di odê de kêmbike, lê rehên wê nêzikî hev nabin û her diçe dengê wî qalintir dibe û ewî bêtir riswa dike.

- Ez du salan bi şûn ketime; heya bi heyşt saliya xwe ez mektûme mabûm û piştî ku, em hatin Bajarê Mezin, bavê min neçare mabû ku, îzlemê derîne, heya ku karibe li kargehê kar bike û wî xwest çend navên din jî li me zêde bike, da ku mehiya wî bilintir bibe. Lê nedizanî ku, devên dêwine din li ser xwe vedike.

- Xwendina te rinde; bavê te dizane bixwîne. Dema Koçer dît ku, ew bê deng ma, xwest zanibe çî li piş wê bédengiyê heye: tu çima bê deng ma.

- Na, bavê min nizane bixwîne.

- Tu ji ber xwe wilo derketî, bêyî ku kes alî te bike. Koçer jê negerî û hespine rewan di çavên wê de dibîne.

- Kalemêr alî min dikir. Bersiva wê dihêle ew dev vekirî bimîne; wî her roj tiştine nuh li ber xwe didîtin û nemaze li ser Kalemêr.

- Ma ew dizane bixwîne.

- Belê, ew bi firansî jî dixwîne; di demên ku Firansa li vê derê bûn, ew milîs bû. Bersiva wê dihêle çêrokeke wî ya kevin bi bîr bê; ku çawa hespên milîsan di hewşa wan de dişihîn. Û ev yeka dihêle xelegeke din, ji yên ji bîrbûne, di mejî de cih bigre.

- Êh...h, te ewqas pirs ji min dikirin, de ka tu jî çêroka wî ji min re bibêj.

- Çi çêrok. Şêrîn bi tirs di pirsê û çavên wê tijî baran dibin.

- Ew gulên sor. Hinek lertzîn dikeve gewdê wê û Koçer banga ivetiyê di nirînên wê de dixwîne; eger ku tu naxwezî çêrokên Kevin vegeerî, tu dikarî pirsê min ji bîr bikî. Ewî nedixwest seranser êrîşî wê bike û bihêle ku, ew ji ber xwe hemû tiştî li pêş wî rêxîne.

- Na, belkî ev cara yekemîne ku, dixwezim dilê xwe ji yekî re vekim; kesekî din hevpariya min, di raza min de, bike û bila tu zanbî ku, heya bi diya min jî tiştî nizane û dê ya dawiyê ye di bihistina evan tiştan de. Demek dirêj bê deng û çav damrandî dimîne û heya gava ku, wê ji nuh ve dest bi denkirinê kir, dîsan jî çav venekirin: çêroka van gulan ji rêza sisiyan de dest pê dike, ji berî wê jî min ew didîtin lê dîtînin min, jê re, hertim bi lezbûn û hinek tirs jî bi min re çêdikir, heya dighe ewê roja ku, ez û du zarên cîrana, bi hev re, ji dibistanê vegeerî mal û gava herdu zarên rêza yekem, ji bilî wî, ti kes, din di avahiyê de nabînin, ew dêt bi girîdikin, lê derxistina çend seriyên şêkir hêştin ku, ew giriyên xwe ji bîr bikin. Şêrîn di vir de hinekî li derdora xwe dinhêre, weke ku yek bitirs be, ka kesekî din li wan guhdar dike yan na û gava ku, dilê wê hinekî rûdine, ew ji nuh ve vedigere çêrokê: û piştî hêdîkirina wan ew li min vegeerî û got: Tu jî were alî min bike, da ku, em xwarinê çêkin. Û ji zariwan xwest ku, ew li hewşê bilîzin, heya xwarinê çêdibe. Bi gaveke li şûn û yeke dilxwaz ez derbasî oda wî bûm, lê nişkabûneke din li pêşiya min bû; xwarina me li wê derê bû û dema dît ku, ez lê dinihêrim, gote min: Divê em hinek hêk jî biqelînin, ev tîra we nake.

Wî hemû tişt danî ber me, lê ji nik min jî bi dûr nediket; An bi destê min digirt û digote min wilo bike-neke, an jî ez... Şêrîn di vir de radiweste, rû-dême wê sor-gulî dibe û dema dibîne ku, Koçer li çavên wê dinire û li hêviya dawiya çêrokê ye, ewê xwest jê re bibêje; "nehêle ez pêde biçim û bila kaniyên kevzê weke xwe bimînin". Lê nirînên Koçer dihêlin ku ew, careke din, vegere bîranînên dûr; û cara ku ez xistim hambêza xwe, min nizanî ezê çibikim û tewka hêkên qelandî bi ser lingê min de rijî, şewat û giriyê min bûne yek. Lê piştî katekê û bi dest xistina sêvekê, min giriyê xwe û lingê şewitî ji bîr kiribû û ez û wî bi tena xwe di odê de mabûn; herdu zarên cîrana jî li hewşê dilîstin.

Şêrîn li evê derê radiweste û piştî ku, hinekî bê deng dimîne, ew careke din li çêroka xwe vedigere, lê Koçer bala xwe didêye ku, dengê wê hatiye guhartin û weke ku, çêrokeke ne bi wê ve girêdayîbe, ew bi gotinin sar salix dide: piştî me hundir da hev û bi dest xistina sêvê re, min jî xwestibû ez derê û bi wan re bilîzim, lê ewî bi boneya şewata lingê min, rê li ber min girt û dema dît ku, dilê min û girî heye, ez bi mozekê razî kirim û di odê de girtim.

Keçik di vir de radiweste û yekî dikarî dengê lêdana dilê wê bijmarta, Koçer jî mîna ewê ketiye avsînê û nedixwest niçira wî bireve, bi zor-zora, bihna xwe ber dide û dema bê dengiya wê dirêj dike, ew nasdike ku, ev gava dawiyê ye û ewê di binê benê wer bibe û gava dike ku, evê demê bi cixareyekê bişewtîne, Şêrîn yekê ji xwe re jî dixweze û piştî ku, çend hilmin kûr dikşinin, ew careke din vedigere çêroka xwe; Heya bi demekê ez di hambêza wî de mam û gava naskir ku, dilê min û çûyînê heye û bi boneya ku, ew dixweze li birînê binire û careke din derman ke, ez di hambêza xwe de girtim. Lê her diçû, hilm û bihna dûyê cixaran, kulma girî di çavên min de mezintir dikir û tiştê ku, hîne tirs di hinava min de ferehtir dikir, ewê ku...

Ew careke din gotinên xwe dibire û Koçer bala xwe didêye ku, dilopên hêsiran nema ji dû hev kêmbin û ew yeka dihêle ku, ew bi destekî wê bigre û bêyî ku, keçik bala xwe bide ewê yekê û weke yê mestketî, ew berdeamiya çêroka xwe dike:- ... **Dûmahîk Rûpel: 15**



**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

-herçû tirsî min bi ewê tiştê ku, di nav lingên min de mezin dibû, pirtir dibû û her ku min dixwest ez jê birevim ew bêtir nêzîk dibû û bêtir ez diguwaştim ser hev, heya tirsiyam ku parsiwên min bişkîne û di kêlîka ku, min dikir ez bigrîm, wî destên xwe li ser min sistkirin û xwe li ser piştê dirêj kir.

Şêrîn li vir cixareyeke din pêdixê û bê rawestandineke dirêj vedigere ser çêroka xwe; bi dîtina rehên xwe yên tazî re û lertzandina ku, ketibû laşê Kalemêr, tirsê ez hilînam û hêşt ku, ez birevim derve û bi derketina min re, herdu zariwan êrîşî ser min kirin û hêştin ez bêtir bitirsim, lê bi revandina mozê re, dilê min hinekî rihet bû. Dema bê dengiya wê dirêj dike, Koçer jê dipirse.

- Te ti tişt li ser gulên sor negot; ew ji ku tanîn. Pirsî wî nirîneke xemgîn û bê hêviyekê di çavên Şêrînê de diçînin; ewê hêvî dikir ku, ew bi xeyd, hinek sixêfan ji Kalemêr re bide. Û ev yeka dihêle ku, ew mijara pirsê biguhêre: Te ne got ew rûniştîyên vê avahiyê, çima di ewê rojê de, giş bi hev re windabibûn.

- Lawekî Agob bûdele hebû û di wê rojê de pê re derketibûn mezal, da ku, wî veşêrin. Bihîstina salixa bûdeliya lawikê Agob, pirsê fereh di mejiyê Koçer de derdixê; çî çêroka bûdeliya zarên Agob e.

Ew demeke dirêj û bê ku bédengiyê biçirînin, li hember, hevdu dimînin û gava Koçer diçe û di nik wê de rûdine, ew ji cihê xwe nalive û ne jî bermalka ku, kişyayî û hêştîye rehên wê bi tevayî tazî bimînin, dikşîne ser xwe, da ku, li ber çavên wî bibire. Lê gava Koçer dêst datîne ser taziya wê, ew dilerize. Û barandina hêsiran dihêlin, ew ji nuh ve vegere cihê xwe yê berê.

- Bibore. Vêxistina cixareyekê dihêle dengê wî bête birîn. Wî careke din bi te re wilo nekîr. Pirsî wî, kenekî tinaz li ser riwê Şêrînê belav dike.

- Heya roja ku min tu li vir dîtibû jî, ez ji oda wî dihatim. Ev rûhişkî û bêfedîbûna Şêrînê, dihêlin Koçer ji keçik zir bibin.

- Te çima ji diya xwe re nedigot. Bihntengiya Koçer, asoyekî vekirî li pêş Şêrînê der dixê û ew bi qehra wî dilxweş dibe.

- Min jî dixwest. Keçik helwestê hildide pileya herî bilind û dihêle Koçer, di korta ku jê re dikola, wer bibe; bi evê bersivê re ewê hêştibû ku, cûbarên xwêdaneke sar di gewdê Koçer de derbibin.

- Te. Ew asoyên vekirî bi hezar rengî têtin xemilandin.

- Tu çima şet ma, belê min jî dixwest. Erê ez cara yekê tirsiyam, lê piştî ku ji oda wî derketibûm, min naskir ku bi vîna min bû jî, belkî min nedixwest bi wî re be, lê ew yeka di xewnên min de jî hebû.

- Bes... Koçer ketibû xefka diltengiyê.

- Çima, ji ber ku ez hîne zarok bûm ew jî kalemêreke; ew yeka baştirî, ji lîska bi zarên cîrana re bû, bi kêmayî ewî nedimîst û lehingiyên xwe ji tikesî re nedigotin.

- Ma zariwên cîrana wilo dikirin. Koçer nikarî rovîtiya xwe veşêre û vê pirsê hêşt ku, Şêrîn ji xewneke giran şiyar bibe û dema wî dît ku, ew di cih de rabû ser xwe, jê dipirse: Tu yê bi kuve biçî. Ewî dizanî Şêrîn dê biçê kuderê, lê pirsî wî bergerek bû, da ku, ew hinekî din bi wî re bimîne.

- Ezê biçim.

- Ez dikarim nasbikim, te çima a nuha fedî kir.

- Nizanim, bes gerek bû min ev çêrok ji te re negota, ez te hîne nasnakim û keçka bi ku, hinekî rûmetiya xwe bigre, evan tiştan ji xwe re dihêle.

- Bes ez jî ne her xortekim, an ez şaşim; tu min weke her yekî din dibînî. Wî xwest bi delewerî erêyekê jê bistîne. Şêrîn jî bi ya dilê wî dike û vê carê destê xwe ji binê wî narevîne, lê Koçer xwest ji cara çuyî sūdê bibîne, lewre ew bi evê serkeftinê naxape û wî dikir ku, hêdî - hêdî ber bi armancên-

-xwe biçê û kelayên wê yeko-yeko dagirke, lewre dema ku wê got: Ezê biçim. Wî jê re negot; ka hinekî din bimîne. Şêrîn çû, lê wan dizanî dê zû û pir zû hevdu bibînin.

Piştî ku Şêrîn derket, ew jî vegeerî ser têtî û pozê xwe xiste nav mitêlê; cihê ku Şêrîn li ser rûniştibû û çend caran bi kizûr bihin kişand, heya hêşt ku kezba sipî biçire û hinek ji bihna wê di sîngê wî de lûs dibe. Bi evê yekê re ew xwe li ser piştê dirêj dike û çêroka Kalemêr, hêdî-hêdî, di seriyê wî de dimeye; çima hertim destpêk ji dawiyê paqijtir û çêtire.

Ji dema ku Şêrîn bi derketî û heya piştî çar katan, Koçer xwe mîna laşekî mirdar, bê liv, li ser têtî dirêj kir. Çend caran kir ku rabe û ji mal bi derkeve; wî du caran jî cilên xwe li xwe kirin, lê di herdu caran de jî ji nuh ve ji xwe kirin û mîna kelhoyekî xwe li ser têtî dirêj kir.

Pir ta û bûyer di jiyana xwe de vegeandin û çêrok li gor dilê xwe dirêstin; hin tişt ji wan kêr dikir û hineke din dixistin şûnê, lê carna jî di nav tiliyên wî de diqetiyên û ew tazî dima. Koçer di konkê jiyana xwe de dipirpîtî û deziyên wê li xwe dipêçan, heya dengê zaro jî, dê nikarîba wî ji wir bikşîne, eger ku neketa hundir û bi ser guhê wî de neqîra.

- Te xêre, tu çî dixwezî. Bi çavne niv damrandî dipirse.

- Agob te dixweze; jina wî gote min ez bange te kim. Zaro gotina dawiyê di derî de got. Ev cara pêşîye derbasî oda wan dibe. Di derî de rastî keça Agob tê û ew bi kenekî berz wî pêşwaz dike û derbasî odê dike, ji berî bighe cihê Agob û li rewşa wî bipirse, pîreka malê ji piş ve deng lê dike û kêf - xweşiya xwe, bi hatina wî ya li cem ewana, tîne zimên û ji Koçer re cihêkî di nik nivîna mêrê xwe de datîne.

Piştî silavan ew hinek derfet didin Koçer ku, nirînekê li oda wan bike; ti tiştî zêdeyî gerekiya jiyana mirovekî, di hundir de, nabîne û dema dît ku, bê dengî gelekî giranbû, xwest hinekî jê biçewtîne.

- Ez hêvî dikim ku, hûn kêmasiyên min biborin. Koçer bêyî ku kesekî bi nav bike, hevoka xwe got. Divya bû ez li rewşa we bipirsiyama, lê weke min bihîst, we nedixwest bi tikesî re rûnin. Hevoka dawî gote Agob.

- Belê; lewre gava min hinekî xwe rihet dît, min xwest ez bi te re rûnim. Erê em hîne hevdu rind nasnakin, lê weke ez dibînim, tu yê bêtir ji min bawer bikî.

Koçer dinire ku hinek tirs di çavên Agob de şîn dibe û ji berî ku, gotina xwe bi dawî bîne, keça wî derbasî hundir dibe; di destên wê de cezwê qehwê ye, di gel sê fincana û di çaxa ku, ew fincanan datîne ber wan û dixweze tevî rûniştina wan bibe, diya wê jê re dibêje: Me bi tenê bihêle. Keçik bi xeyd radibe û di derî de li Koçer dizivire û qefteke ken li şûn xwe dihêle.

- Tu dikarî bi rihetî dilê xwe vekî û heya ji min bê ezê ti kêmasiyan nekim. Erê Koçer nedizanî babetê çibe, lê di riwê Agob de bihna tirseke giran û kûr dibîne.

- Li min weke ewî cotariyê ku, piştî keda salekê, zîwan li şûna gênim çinibû, hatiye.

- Merema te ji evê gotinê çî bû. Marî dipirse.

- Ne tişt, gotinekbû û derçû. Koçer... Ew hinekî bê deng dimîne, dixweze giraniyekê bide gotina xwe û piştî ku, ew firekê ji qehwê dibe, ji nuh ve ber bi ban ve dinire û deng pê dikeve: Weke ku tu dibînî; ji bilî evê niv keça min, dê ti kes li şûna min nemînin. Salên min li dor heystê ne û di jiyana xwe de min bi qasî mûyên seriyê xwe eş û tirs dîtine; bêtirî carekê ez ji devê tîrbê vegeerîme, lê weke tirsî ewê rojê min hîne nedîtibû. Dema ku Agob bihna gotinekê li ser lêvên Koçer dibîne, ew jê hêvî dike ku, axaftina wî nebire heya gotina xwe bi dawî dike û di piştî re tiştê ku, ew bixweze dikare bîne zimên.

Koçer hinekî ji evê dirêjkirina mijarê bihin tengbû, lê ji bilî rawestandî û naskirina dawiya- ... **Dûmahîk Rûpel: 16**

**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

-çêrokê, ti riyên din li pêş xwe ne didîtin, lewre ew li xwe zor dike ku rûmetiya salên wî bigre, da ku, karibe gotina wî bibhîse û destora kişandina cixareyekê dixweze.

Bila hinekî bihna te fereh be, yê mîna min ku gihêştine pileya xerifandinê, dê ji bilî wilo ti tiştî din bi wan re dernekeve; heya ji min bê ezê babetê, bi kurtî, ji te re bibêjim.

- Na apo; kêmasiyên min bibore, guhên min ji te re vekirîne.

Koçer xwest bihintengiya xwe bincil bike û di kêlîka ku, du hêsir ji çavên Agob tên xwar, hestekî tenik bi wî re çêdibe û eger ku, ne ji şermiyê ba, dê ew têxista hembêza xwe û bizavên xwe bikirana, da ku wî hêdfî bike.

- Na kurê min, em pîremêr tiştan pan û dirêj dikin. Neyse, ez di şerê 1915 an de, deh salî bûm, em sê bira û çar keçik bûn. Lê ez nizanim ka kes ji wan ma yan na... Em vegehin destpêka çêrokê, ka me çi dît û dît; ez di ewê baweriyê de me ku kuştin, talan, zikteraşkirin û serjêkirina Ermeniyên di ewî şerî de, te jî li gor xwe li ser bihîstî û xwendî û belkî tu niha di nava xwe de dipirsî: Çima ev pîremêrê xerifî bûyerên ku, ji berî heftê salî tîne meydanê û çi hêviyên wî jê hene; xwesteka min ewe ku, ez karibim tirsên ku min dîtine bînim ber çavan û ji ber wê yekê û weke tu dibînî ku, ew tirs di zarên min re derket; giş nîv mirov dihatin û mirinê qalûça xwe di wan de bi kar tanî. Giriye Marî hêşt ku, ew gotina xwe bibire û dema ku, Koçer dixweze di ber dilê wê re here û ew dibêjê yê: Bihêle, bila ew kela xwe birjîne. Dihêle Koçer kûr bi gotinê birame; "evqas sal çûne û hîne ew kela nerijiyê".

- Bes te negot ka di ewê rojê de çi bi te re çêbûye. Piştî demekê, ji hêdfîbûna Marî, Koçer dipirse.

- Bi du gotinan; tiştê ku min dîtî nakeve mejiyên û ne jî dive yek bawer bike, belkî di xewnên gawerekî de wilo çêbibe. Di virde Agob hinekî diraweste û weke ku, ew bixweze hinek mêtantiya xwe kom ser hev bike û ewan wênayan bi heve ke, ew çend caran û di pencerê re ber bi odeya Kalemêr dinire û ji nuh ve vedigere ser çêroka xwe; di ewê rojê de û dema ku, min xwest ez hinekî bi wî re rûnim û çend katan, xwe ji pêş mirinê veşêrim..., ez di deriyê wî de rastî heftê hezar rengên mirinê hatim û ez ji te bi hêvî me ku, tu ji min bawer bikî.

Bergera Agob ji dil de bû û wî hêştibû ku, Koçer bi dil tenikî lê guhdar bike. Bi rawestina min a di deriyê Kalemêr de û bi dîtina pilindrê ku, nivê odê girtibû, digel ewî marê reş ku, bi hev re ketibûn nav şerekî giran, çend caran min xwe qurmişand û gote xwe; belkî ji xew şiyar bibim, lê ne xewn bû. Pêre-pêre riwê Agob berdavêje û dibe riwê miriyan, ziman jî giran dibe: Ka tu dikarî vê yekê bawer bikî ku, wilo bibe û kanî ew pilindrê ku, ji kerekî mezintirbû bi kuve çû û ew çawa ket vir. Û deriyê Xwedê vekiriyê; di ewê hîngê de gêjbûna min ez ji pêş lehiya evan pirsan revandim, lê a nuha û piştî ku, ji bin akama sergêjiyê bi derketim, ez nikarim ji pêş evê lêmişte birevim.

Koçer ne dizane ku, Agob hişê xwe winda kirî yan jî xewneke xwe ji wî re salix dide; tiştê ku ew dibêje nayê bawer kirin, lê ew nesax ketina Agob û dîtina wî ya ji pilindir re, di kuncêkî banê oda Kalemêr de, dihêştin ku Koçer guhê xwe bide ser çêroka wî, nemaze dîtina wî ji Kalemêr re, ji berî demekê û wê şevê, di kolaneke bajêr de û bi wê rewşê, evê yekê bêtir di dilê wî de dimeyîne.

Piştî hefteyekê, zarokêkî pênc salî ji yê avahiyê, dê winda bibe û birayê wî, yê ku pê re bû, nesax dikeve û ewê di nav nivînan de bipeyve ku; di nivê wê şevê de, pilindirekî zer êrîşî ser nivîna wan kiribû û birayê wî ber bi oda Kalemêr kişand.

- Ez tîneghim ku, tu dixwezî bighî çî û ka ezê, ji te re, çî bikim. Koçer dipirse û ji berî ku, ew bipirse jî Agob eynî ew pirs ji xwe kiribû, lê ti bersiv nedît. Tenê dizane ku ji aliyê mejiyê xwe yê veşartî ve ew tete têvedan, da ku, tiştê dîtîye ji keskî-

-din re bibêje û ew gihêştibû ewê baweriyê; eger ku wilo neke dê bighe diwêrinê.

- Ez dixwezim tu baweriyekê bidî min; ka tiştê min dîtibû xewneke min bû, an bi rastî min ew mar û pilindirê zer, di odeya wî de, dîtine.

Ango tu derbsî oda wî bibe û ewê yekê nas bike.

- Çawa tu vê yekê jê dixwezî û te got ku, ew ne dostên hevîn. Marî dipirse.

- Na, em hinekî nêzikî hevbûne. Koçer lê vedigerîne.

- Bes kêfa wî ji te re nayê.

- Marî. Agob bi qehir deng li jina xwe dike, da ku, wê bide rawestandî û nehêle ew wê derî veke.

- Çi heye û çima kêfa wî ji min re nayê. Wan meraqek ji Koçer re çêkirin û xwest zanibe, ka çî ji wî vedişêrin.

- Ne tişt, gerdişeke wiye; her ku yekî nuh tê, ew di destpêkê de jê direve û gûmanên xwe tîne ser ku, belkî ew kesekî ne îsîz be, ji ba cina hatibe. Lê ev gerdiş demeke kin dajo û a nuha hûn bûne dostên hev.

- Ne xeme, ka ji min re bibêje; eger ku tiştên te dîtibûn rast derketin tu yê çibikî. Pîrsa Koçer weke ku, yek marekî berde hundir odê, dihêle kesên rûniştî ji cihê xwe bêtin avêtin.

- Ezê, rojeke bi tenê jî, teve wî nemînim. Çawa û kî dê derkeve û kiyê bimîne, nexeme. Di cih de Marî bersiva wî dide.

- Ezê îşev biçim cem wî, belkî ez karibim tiştêkî ji nav diranên wî derxînim û nuha ji berî ku, ez derdikevim hûn ti tiştî din dixwezim.

- Na, em saxiya te dixwezim. Lê ji berî ku ew ji derî derkeve, Agob deng lê dike: Ji berî tu diçî, min bihîst ku, tu ji xwe re li karekî digerî.

- Min ji wî re got. Marî dibêje.

- Ez ji xwediyê xwaringehê re çî bêjim; tu yê bi şev li şûna wî rûnî, ango weke osteyekî kar û barê wê derê bimeşîni, eger ku em ne bêjin weke xwediyê wê. Agob dixweze camêriyekê bi ser Koçer xîne; ew ji wî re pirsî bû û di riya pîreka xwe re, li cem dostekî xwe karek jê re dîtibû.

- Hinekî li min raweste, îşev an jî sibe, ezê erê-naya xwe bidime te. Koçer û bêyî ku titiştî din li gotina xwe bar bike, ji odê derdikeve û ji berî ku, ew bizîvre oda xwe, ber bi pencera jor dinêre, lê ti kes tê de nedît.

Gava ew dikeve hundir şê dimîne, di pêşî de gote xwe: "belkî ez ketime odeyê cîrana". Û kir ku, ji hundir derkeve, lê gava çavên wî bi kemancê û maseya ling şewitî dikeve, tê derdixwe ku wî şaş nekiriyê, bes destekî zêrîn di ser re çûye û hêştîye ku, can bi her tiştî de bête berdan û ew bibirûse û gava pelê ser masê dixwîne, xwediyê destên zêrîn dinase û dihêle ew sed hezar sixêf û xeber ji çêrokên Agob û Kalemêr re bide; ewên ku hêştibûn ew ne li hundir be, di dema serdana xwediyê destên zêrîn de.

- 6 -

Di dema ku, deng bi derî ketibû, ewî li wênayê Şêrinê ku, di hevdişina dawî de jê re hêştibû, dinirî û dengê derî dihêle, ew hinekî vecinîqê û ji xwe bipirse: "dê kî be ewê li derî dide, belkî ew ji nuh ve vegeirî be û dixweze akama nameya xwe bibîne". Û gava ew hinekî dereng dimîne, ewê li piş derî deng bi xwe dixwe û bi naskirina wî re, Koçer deng lê dike.

- Tu çima derbas nabî. Ew ber bi derî ve diçe.

- Qey çêdibe ku yek, bê ferman, derbasî odeya pêximberan bibe; dive her tim yek hesabê xwe û nişkabûnekê bike. Lê tevî ewê yekê jî û eger ku, tu çiqwasî paçan di qul û qevîşteken derî û diwaran kî jî, da ku, salix û durîşmên ku li cadê tene hildan, derbasî odeya te nebin û pozê te pê neşewte, dê riyekê ji xwe re bibînin û seriyê te pê bêşinin; heya yê weke min ku, bi gemara cadan mezin bûne, dikevin odeya te. Kamîran bi ken dibêje û- ... Dûmahîk Rûpel: 17



**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

- destê xwe ber bi wî dirêj dike.

- Ka bighe hundir û di pişt re dêst bi tinaziyên xwe bike. Piştî ku ew da rûniştin, Koçer dinire ku, ew bi çavekî matmayî li dora xwe dimeyzîne. Te çi winda kirî û tu lê digerî. Pirsra Koçer, hinekî, çavdêriya wî sar dike.

- Min oda te şaş kirî yan tu ne ewê ku, ez wî nas dikime; ev ne bi destên te hatiye hilmaştin û ne bêje ku, te jinek ji xwe re aniye, çimkê ev tiştên han ji we ne dûrin.

- Ev giş ji bo ku, oda min hinekî paqij bûye, ma ez evqasî yekî pintî bûm.

- Ne tu tenê..., dive oda yê hunermend ser-binî hevdu bûbe, da ku, xwe nebîne kêmtirî Sîlvedor Dalî ye, ev yeka bûye ji kesîtiya we. Ango yek ji we nabe hunermend, eger ku durv û cilên wî, odeya wî, jiyana wî ser-binî hevdu nebin; ew mirovekî nenormal û gereke ew çakête xwe têxe binê pantilon.

- Danehev û duristkirina mal û civakê, me ji we konevanan re hêştiye. Tu çima derfetê nadî min ku, ez li rewşa te bipirsim.

- Tu baş dizanî ku, ev pirs qerfa min tîne; rewşa me hertim ewe, ma çi di jiyana me de tete guhartin, çiyê nuh heye..., hertim ew gotina ye; başim. Eger ku rewşa yekî gû be jî, ewê bibêje te: Ez başim, bêyî ku ew zanibe çi merema gotinê ye. Hema ew nizane çi dibêje, eger ku ew mirî be û têr mirin bûbe jî, dîsan jî ew "başê". Koçer bihintengiyêke bê kenar, di gotinên dostê xwe de, dibîne.

- Hema mirin û jiyana, du rûyin ji yek dozê re; baş bala xwe bide jiyane, tu yê têbighî ku, çêroka me nêzîkî çêroka ewên ku, di bin qesra mîr de, şikeft û berqef dikolan; wan baş dizanî ku, piştî dawîya kar û cefa wan û bi dawîkirin û serîkirina kolanê re, mîr dê seriyê wan jêke.

Lê tevî evê yekê jî, kesî seriyê xwe hilneda û ji mîr re negot: Na. Û ne jî gote xwe: Eger ku, îroye yan jî sibe, min seriyê xwe winda kir, dê çi cudayî hebe û ezê bi xwarina kêleke kepekî din bi kuderê gihê. Tevî ku windakirina jiyaneke wilo, di rojekê ji berî ya din, dê ked û êşên yekî kêr bike. Û jiyana me jî wilo ye; ha yek îro miriye yan jî piştî sed salî din, dê her bimir û di van salên dirêj de, ewê bêtir êş û zeman bibîne, çima yek newêre bêje xwe: dê heya bi vir û bes.

- Te çêroka Manî xwendiyê; ez pir caran, di demên ku bi xwe re rûdîştim, min ew çêrok di mejiyê xwe de vedigerand.

- Tu gihêştî çi tiştî. Koçer di pirsê û radibe ser xwe ku, du piyalên qehwê çêke.

- Belê, ez ji zûde li benda evê pirsê me ku, yek ji min bipirse. Ez dikarim ramanên xwe, di çend hevokan de bînim zimên. Em dikarin bibêjin; erê Manî mirin dixwest û vexandina wê dikir, da ku, dawîya jiyane zû bê û gerdûnê ji êşê û roniyê jî ji tariyê rizgar bike. Lê ew bi xwe lawê jiyane bû û dijiminên ku, vexandina jiyane dikirin, lawên mirinê bûn.

- Ew çawa bû; te ewê ku, jiyane dixweze kire lawê mirinê û yê ku, mirinê dixweze jî kire lawê jiyane. Xuyaye xwendina te ya ji helbestvanên sofî re, hinekî, mejiyê te celq kiriye. Hevoka dawiyê dihêle Kamîran berkenî bibe, lê ew sîme pir dirêj nake û ji nuh ve sîmeyeka tîr û giran, di çavên wî de şîn dibe.

- Ez dikarim bi van gotinan berevaniya xwe bikim; jiyana xewneke, ji yê helbestvanekî, Xwedêyekî. Lê çêroka me ne eve, em werin û li çêroka Manî û cîgir binirin ku, çawa Manî vexwendina mirinê dikir, lê destê xwe navêje şûr û seriyê wî jênake û li hemberê yê cîgir jî, vexwendina jiyane dikir û dêst davêje qevda şûrê xwe û seriyê Manî jêdike. Bi şirovekirina wî re, Koçer bala xwe kûr dide dostê xwe ku, ewî bi akama çêrokê re dilerize; mîna ewê ku dest hatibe ser û têderdixê ku, di van çend mehên ku, ew ji hevdu bi dûr ketine, pir tişt di wî de hatine guhartin. Û wilo em tê digihên ku, ewê dibêje: Jiyana, ewê yekê tenê ji bo xwe dixweze û yê ku dibêje: Mirin, ew jiyane ji yê din re jî dixweze û pir caran, jiyana xwe jî dide ser. Bi kutakirina-

-gotinê re, Koçer weke şopa hêstreke, di çavên wî de, dibîne.

- Bes te tiştî ji bîr kir; eger ku Manî di şûna cîgir de ba, dê dest avêtiba qevda şûr an na. Koçer di dilê xwe de got: "min ew girt û nirîn û dîtînen wî dê nuha hilweşin".

- Belê..., ez baş di ewê yekê de jî ramiyam û weke min got: Hertim jiyana di destê yê serdar daye û helbet dê ji xwe tenê re bixweze û mirinê li dora xwe belav bike. Lê yê ku di bin pêyan de be, dê mirinê ji xwe re bixweze, bêyî, ku karibe xwediyên "pêyan" tineyî bike.

- Na.. aa, xûya dike ku, vê carê tiştêkî nuh heye.

- Na, bi seriyê min û te. Bes xûyaye ku, guhartin di min de çêbûne. Qerfa min ji hemû tiştî tê û hema ya kin, ez ji tere bibêjim: nema baweriya min bi ti tiştî tê.

- Bes tu nebî helbestvan; ev rewşa te ji gerdişên wanin. Koçer bi nîvhenekî dibêje dostê xwe û gava dibîne ku, sincê ewî li henekan tineye, ew vedigere û bi rengekî şanoyî dibêjêyê: Hinekî bihna xwe fere bike û ezê nuha çayekê jî ji tere çê bikim ku, bihêlim tu ti car din çayê venexî. Koçer, bi kenê xwe ve, ber bi quncikê ku, firaq lê danîne, diçe.

- Wek wê cara ku, te li cem Seleh Îbo çêkirî.

- Dilovanî, li dê û bavê te; te hîne ji bîr nekirî. Koçer hevalê xwe baş dinase û ewî dikarî, zû-zû, deriyên wî vekirana.

- Ma ew çawa ya ku, ji bîr bibê ye. Bihêle, emê qehweyêke din vexun. Kamîran ewî tûrî dide dest Koçer û dibêjê yê: Min hinek qehwa Razî bi xwe re aniye, tê bîra te.

- Ma ew yeka jî, tiştêkî ji bîr bibê ye. Tu, hertim, bavê feqîr û belengazan bû. Bi vekirina devê tûr re, bihna qehwê li hundir belav dibe û Koçer mîna ewê ku, ji zû de tiştêkî xwe wînde kiribe û a nuha rastî wî hatibe; tûrê qehwê ber bi hembêza xwe ve dike û çend fincan dide xwe û dibêje: evê bête vexwerin, ne wek evên ku, em ji van firoşgehan dikirin; Xwedê zane û ez jî dizanim ku, di ser nîviyê wê re nok û cihe, an jî nanê hişke.

- Dê li şûna ku, tu dilîzî, wê deyne ser êgir.

- Îro ez te bernadim; ezê serî li te bikim dahol, belkî em karibin wî celiq bikin.

- Tu bi Xwedê dikî ne îro be; hema du gotinan û weke ku tê xwestin, ez nizamim li dû hevdu berdim.

- Ne tirse; axaftin dê ne di warê konevaniyê de be. Koçer, heya bi ewê demê, cezwê qehwê danîbû ser papora gazê û Kamîran jî ber bi refên pirtûkan ve çûbû.

- Çiyê nuh li cem te heye ku, bihêle yek hinekî bihna kefnikê ji bîr bike.

- Ne tişt; ji zû de ez ne çûme pirtûkxanan û ne jî ezê biçim.

- Çima. - Çi çima, ne dive ji berî her tiştî ez pariyê xwarinê, di beriya xwe de, bibînim û di pişt re ez bi mejiyê xwe bi ramim, weke ku Markis digot. Ez ditirsim, bi çûna xwe ya pirtûkxanan, ez xwe negrim û destan bavêjim pirtûkan, wan bidizim û sedî-sed, ewê bi min re bêtin girtin.

- A ji te re Can Cîne yekî din. Ev roman a Selîm Bereket ya dawiyê ye.

- Kîjan; El Rîş. - Ma ji bilî ewê ti tiştî din li cem te heye.

- Belê; sê berhemên wî yê din li ba min tînen. Bêyî ku, li wî binire, Koçer radihêje du piyalên çayê û bi qehwê dadigre.

- Na.. aa; ti kes nikare înkare bike ku, tu di çêkirina qehwê de, osteyî.

- Ew jî başê ku, em bi kêrî tiştêkî tînen.

- Belê, tu dikarî di çayxaneyekê de kar bikî, bêyî tîrsa ku ew bera te bidin. Gotinên wî, bi bîr Koçer tîne ku gereke ew îro bersiva Agob bide; dê di xwaringehê de kar bike ya na. Piştî ku, çend caran, ew çêroka dabû şûn, xwest nirîna Kamîrên, di ewê yekê de, nasbike. ... **Dûmahîk Rûpel: 18**



**ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:**

- Tu hîne jî dikarî ramanên min bixwînî; minê bigota te ku, xwediyê avahiyê bû çend car dibêje ku, karekî wilo, ji min re, dîtîye û ew bersiva min dixweze.

- Başe, ev salix hêjayî ku, yek ji bo wê ahengekê li darxe. Te negot wî çî kar ji te re dîtî.

- Ezê di xwaringehê de karbikim. Mîna ku, yek zerkeke ava sar bi ser wî de ke, basik li Kamîrên dişkên.

- Tu yê nikaribî ewî karî bi serî bikî. Ew bersiveke kin û kurtbirî dide wî.

- Ne firax şûştine; ezê şûna xwediyê wê bigrim, ewê bi roj li wir be û ez jî bi şev. Koçer nihirî ku, siya kenekî qeşmerî, li ser riwê wî, belav bû.

- Te jî bawer kir, an te xwest tu bibêjî xwe: Min ev tişt bawer kir. Nirîna yê weke dostê te; xwediyê xwaringehê, ji yê ku, li ba wan kardikê re ku, ew bi pileyekê di bin seyên wan re ne. Ango, di nirîna wan de, di civakê de, du radek hene û divê yek fermanan bide û ji yê din tê xwestin ku, wan fermanan bi cih bîne. Koçer gotinên xwe dibîse û vê carê, bi rengekî hişk, cihê xwe, di nav pileyên civakê de, nasdike. Lê tevî ewê yekê jî, ew guh li ser hundirê xwe digre û dibêje wî.

- Tu nabînî ku, tu nirînen xwe yê konevanî dixî hemû waran.

- Ez jî dibêjim ku, yê hunermend û eger, ji sibê heya bi êvarê, tu Markisîzmê bi wan bidî lezberkirin, dîsan jî nikarin ji romantîka xwe bi derên. Evbû babeta ku, te dixwest tu li ser biaxîfî.

- Na, ew di warekî din de ye. Koçer gotina dawiyê, bi dûyê cixarê re, berdide.

- A, bi rast, ji berî ku, ji bîra dikim, silavên Siyamend ji te re hene.

- Ew gihêşte kuderê.

- Xwendina xwe kuta kir û jineke xwe anî, nuha jî bi kirîna û firotina xaniyan de ketî.

- Siyamend?!

- Çima na.

- Wî nirîn û baweriyên xwe li kuderê veşartine.

- Bi hineke nuh guhartine. Tu çima dikenî, ew ne yê pêşiyê û ne jî yê dawiyê ye, me tevan wilo kirî.

- Merema te ji gotina "teva" çiyê.

- Ne tişte, ji bîrbik. Ka te ne got babeta ku, te dixwest li ser bi axîfî çiyê. Kamîran dinire ku, riwê Koçer hinekî sert dibe.

- Ez nizamim ji kuve dêst pê bikim û ew bi xwe jî nayê bawerkirin, lê dixwezim nirînen te jî, di van çêrokan de, bibîsim. Piştî pêşgotineke dudirêj, Koçer çêroka Agob ji wî re dirêse.

- Tu heneken dikî yan tu xewneke xwe ji min re salix didî.

- Na, ne eve û ne jî ew û weke ku, bûye min ji te re got.

- Bi rastî tu nirîna min, di van çêrokan de, dixwezî.

- Biner, tu min xweş nasdikî; baweriya min jî bi van çêrokan nayê, lê carina tiştin çêdibin dihêlin ku, zanîn, li hembera wan, bê care raweste.

- Xûya dike ku, xwendinên te jî, yê ji mîtologiya re, akamî li mêjiyê te kiriye.

- Bes Agob diçespîne ku, ewî ev tişt bi çavên xwe dîtine.

- A çêtir ewe ku, tu wî bibî cem bijîşkekî derûnî û hîne dê çêtir be ku, hûn herdu destên xwe têxin ên hevdu û bi hev re herin, ji berî ku, ew ti tiştî din li gotinên xwe zêde dike. Deng bi derî dikeve û Şêrîn dikeve hundir, gava çavên wê bi mêvanê Koçer dikeve, ew dixweze bi nermî şûn ve bikşe, lê ji berî ku, ew ji derî derkeve, Kamîran lê dizîvire û weke ku, ew xwediyê malê be, jê re dibêje: Keremke, ez ji zû de rûniştîme û dikim rabim. Bi dawiya gotina xwe re, ew li Koçer dizîvire û çavekî jê re dadimirîne.

- Tu yê kuva biçî û bi ra, ji berî tu diçî, te negot: Tu ji bo çî hatibû. Ev pirsên wî dihêlin Kamîran berkenî bibe; çawa û heya ji berî Şêrîn bê, ewî digotê: Dê îro ezê seriyê te bi daholkim û-

-bi hatina wê re ew dibêje: Ji berî ku, tu diçî...

- Ma gereke sedemek hebe heya ku, ez bême cem te. Piştî ku, xweş hatina Şêrînê dike, ew xwetir ji wan dixweze û derdikeve.

- Hatina min ne di dema xwe de bû, ne?. Wê di dawiya pirsê xwe de nirîneke kûr li Koçer kir.

- Ji bo. Koçer dipirse û bêyî ku, çavan ji yê wê bibire û ev yeka dihêle hinarûkên Şêrînê sorgulî bibin.

- Min hêşt ew here û eger ku, ez nehatama, ewê ne çûya. Koçer di bin simbêlan re berkenî dibe; erê wî dixwest hîne axaftinê bi Kamîrên re dirêj bike, lê sedî sed rûniştina bi wê re dê xweştir be. - Ti kesî negote wî rabe here û eger ku, tu heya bi siba jî loman ji xwe bikî, nema tu dikarî ewê kêlikê vegeirî şûna berê. - Bes. Keçik, hinekî, ji bersiva wî veciniqîbû. - A nuha wî bihêle, ew çû. Tu çawa daketî.

- Te ne dixwest. - Çêrok ne min dixwest, an ne dixwest. Bes dipirsim; çawa evê şevê hêştin tu dakevî cem min. Bi gotinê re birûsa çavên Şêrînê tîr dibe û da ku, karibe xwe ji xefkên çavên wî rizgar bike, ew û bi lez, gotina ku, ji bo wê daketibû cem Koçer, davêje navbera xwe û wî.

- Bavê min te tekilîfî ser şivê dike.

- Bavê te?! Bi gotinê re, bi milên Şêrînê digire, da ku, bihêle rûyên wan têkeve yê hevdu. Lê dema ku, çavên wan rastî hev tîr, lerezandineke germ di piştê wan re diherike û lêvên Şêrînê ji ser hevdu dikevin.

Bi hembêzkirina Koçer ji wê re û bêyî ku, hesabên cîranan bikin û tirs serî hilde. Şêrîn, bê berxwedan, xwe bi dest wî de berdide, ew jî ji dilekî bi kuzûr, lêvên xwe bi ser ên wê de dadirivîne û destê xwe, di nava wê de, ji bîr dike.

Dema tiliyên Koçer ber bi hinarên sîngê wê ve derdikevin, Şêrîn deng bi xwe dixwe ku, bavê wê li hêviya wane. Lê gava dibîne ku, Koçer ker û lal bûye, ew li ber xwe dide û xwe ji hembêza wî derdixe. Bi lez sîngê xwe rast dike û ji berî ku, ji derî derkeve dibêje wî: "Dereng ne mîne".

Piştî çûyîna wê, Koçer xwe davêje ser têtê û çend caran lêvên xwe dimije; hîne çêja lêvên Şêrînê jê dihat û ode jî bi bihna wê hatibû dagirtin. Wî bawer nedikir, dê ramûsanek karibe, careke din, jiyane di gewdê wî de vejîne. "Gereke mirov bi ya ku, jê hezdikê re nezewice, da ku, hezkirina xwe wînda neke". Di kêlikê ku, ramana zewacyê di serî de digere, ew bi vê bersivê xwe, ji ewê kemenda lîska dil didize. Koçer hîne di ewê sergêjiyê de bû dema ku, dengê kesekî li ber derî dike; cara pêşiyê ku, ew û bavê Şêrînê pêrgî hevdu tîr û gava ku, ew li ber derî dimîne û nayê hundir, dilê wî hinekî rûdine û di sîng de lûs dibe; tirsîya ku, ew bihna ramûsanên ji oda wî bike û ew riswa bibin. Piştî silavan ew ji Koçer dixweze ku, derkevin jor; de keremke, anuha şivê sar bibe.

- Dema derbasî odê dibin, çavên Koçer bi ewê ku, radiibe ser xwe dikevin, dêst ber bi wî dirêj dike, ew jî bi germî destê Koçer dihejîne û dibêjê.

- Ev bûn çend mehên mene ku, em cîranên hevîn û me hîne hevdu ne dîtîye; ma ev yeka ji kesîtiya yê hinermend e ku, gereke bi tena xwe bijî. Koçer heya bi wê hîngê xwe dabû qunceki odê û guhdariya wî dikir; ew tê derdixe ku, yê hemberî wî dixweze xwe pê bide naskirin ku, ew ne kesekî rîje. - Hûn hevdu nasdikin. Bavê Şêrînê dipirse û bêyî ku, bersiva wan bibîse, tiliya xwe ber bi ewê rûniştibû dirêjdike û dibêje: Reşîte Horo, ew jî cîranekî me ye; ew di maliya bajêr de kar dike. Ew jî... Dema ku, dixweze Koçer bi ewî bide naskirin, Reşîte ber bi wî dinire û dibêje: Ez wî nasdikim û eger ku, ev keys çênebûba, ezê şevê li wî bibama mêvan. Ew ber bi Koçer ve dinire; ka gotina wî çî akamî li wî kiriye û gava ku, Koçer nirînen wî dixwîne, di cî de dibêjê yê.

... ( Berdewam Dike ) ...

## EHLAM MUSTEXANMÎ BERSIVÊN HILBIJARTÎ JI HIN HEVPEYVÎNAN\*



Pêşgotin û  
wergerandin ji 'Erebî:  
**Fadil Temo**  
fadiltemo@hotmail.com  
( Kobanî - Sûriya )



Ehlam Mustexanmî - ji yê ku wê nas nake re - torevaneke 'ereb e ji Cezaêr, ew bi zimanê 'erebî - gelek ji nivîskarên Cezaêrî bi zimanê frensî dinivîsin - dinivîsîne, ew xwediya sêyînekê (sê roman) ye ( **Bîra Lêş, Şêlûpêla Hestan, Rêwiyê Xewgeyekê** ), Bîra Lêş ya ku sala 1993 an çapa yekem jê derket ta sala 1996 an 300 hezar rûnivîs jê hate çapkirin, vê romanê xelata Necîb Mehîfûz sala 1996 an bidest xist ( Bîra Lêş hate wergerandin bo zimanê kurdî ji alî Jana Seyda ve di bin navnîşana Bîreweriya Laş ). Ehlemê sala 1971 an ji kolêca toreyê ji zanîngêhên Cezaêrê birwanameyek bidest xist, berî temenê Ehlemê bighe hejde salan ji wê hat xwestin ku kar bike ta ku beşdar bibe di xwedîkirina mala xwe de, loma wê li dirêjahiya sê salan pirogrameke di êzgeha Cezaêrê de amade û pêşkêş dikir di bin navnîşana "**Kustepistne**", û wê helbest û gotar di rojnameyên Cezaêrê de belav dikirin. Sala 1971 Ehlemê helbestine xwe kom kirin di dîwanekê de û çap kirin di bi bin navnîşana "**Li Bendera Rojan**". Ehlem Mustexanmî birwanameya Ph.D. ji Sorbon bidest xist. Berhemên Ehlem Mustexanmî yên dawî ev in: **Dilên wan bi me re ne û bombayên wan li me ne** ( komek gotar ) û **Jibîrkirinek.com** (roman). Û heger ku pirsyarên ji Ehlemê têtin kirin normal in, bersivên Ehlemê ti carî normal nabin, min jî, ji hevpeyvînan ku bi Ehlemê re hatî kirin ji xwendevanê zimanê kurdî re ev wergerand.

**Fadil Temo**

**Pirs: Di despêkê de me jê pirsî: ma tu kêfxweşî bi navdariya ku te bidest xist dawiyê?**

**Ehlem Mustexanmî:** Ez bawerim ku nivîskar nikane binivîsîne û bijî di bin ronahiyê de, çunkî nivîskarê li ronahiyê digere ew nivîskarekî li geweziyan û qirecirê digere li ser *hesabî* afirandinê, û her çiyê ku nivîskar dikane bibêje di hindirî pirtûkê de ye ne derveyî wê ye, serfiraziya min xwendevanên min çê kir, ne rojname û rexnevanan ew çê kir û ne ti kesî ew çê kir, Hemingway dibêje: "*nivîskar yî xwendevanîne wî hene ne pirtûkîne wî hene*" û yê min sê pirtûk hene û hene yên ku sih pirtûkî wan heye û loma ji erkê min ku ez dilnizm bim ji wan re û hemî dema xwe ji wan re terxan bikim, dibe ku ez lêborînê ji rojnameyan bikim, lê nabe ku ez lêborînê ji xwendevanan bikim, û xwendevanekî kor hebû ez wî nimûneyek ji xwendevanî çak dihesibînim, û wî binav bikim xebatkarê ( *mucahidê* ) xwendinê, nîgaş bike, peyayekî kor jidayik bûye, û di jiyana xwe de tîpeke nivîsandî nedîtê û pirtûkan dikire (distîne), wî pirtûka min kirî û buhayê wê bîst dolar in û telefona wî tineye û dibêje:

" *Pirtûk berî telefonê* ", ev kora li zanîne digere û ti navnîşanî wî tineye, nîgaş bike; kerta xwe da min, ta ku navê wî binivîsinim, û min jê re got ezê ji bo wî xelatekê ji xwendevanên min nûderînim di demeke nivîskarên wê ji xwendevanên wê bêtir in.

**Pirs: Û çawa tu xwendevanê ereb yê hevdem dibînî?!**

**Ehlem Mustexanmî:** Xwendevanek heye şemşaqaqan ji te re dike û têt ta înzeyekê bigre, ev xelka tiştêk ji wan re ne xem e, lê yê kor bi temamî bervajî wan e, pirtûk alîkariya wî dike di peydakirina gerdûneke hindirî, loma ez dibêjim û dubare dikim, bila nivîskar çîşkekî dilnizm be, nivîskar ne bi gotin û ne jî bi birwanameyên (şehade) ku bidest xistine û ne jî bi jimara pirtûkên ku nivîsandine, ez nabêjim ez dektorek im, birwaname naçespîne ku ez afiranderek im yan nivîskarek im, min xwezî kir ku ez "Ehlem" tenê bim, eger ne hebûna stranbêjeke bi vî navî ba (Ehlem navê stranbêjeke Îmaratî ye navdar e F.T), nivîskar herçî mezin dibe herçî navên wî biçûk dibe, weke Nîzêr ne gerekî danasînekê ye, em nabêjim mamosteyê mezin Nîzar Qebbanî, çunkî ew bûye rewşenbîrek ( *'elem* ) bêyî ti naznav, çaxê em dibêjin "Nîzar" me ne gerek xistinsereke dî ye ta em zanibim ku mebest Nîzar Qebbanî ye, hema navên mezin ew nîşaneke ku ew nav biçûk in.

**Pirs: Tu bi dilgiriya ketî piştî vê serkeftinê?!**

**Ehlem Mustexanmî:** Nivîskar naye pîvandî bi afirandin û navdariya xwe, lê bi dilnizmiya xwe, û dilgirî dawiya afirandinê ye, û ez dibêjim ku nivîskar dizeke û tewanbar e bi dizîn jiyana xelkê û destbirin ser hestên wan, carnan nivîskar dimeşe û tomar dike lê bi rastyarî (rastgoşî), da ji sincên (rewîşt) nivîsandinê dîr nekeve, heye ku tu bixwî ji çîrokên xelkê û ji ramankirinên wan, û gelek caran tu ji şufêrî tekiyekê fêr dibî, ez ji xwendevanekî didizim ne ji nivîskarekî didizim.

**Pirs: Nivîsandin ji te re çî wateyê dide?.**

**Ehlem Mustexanmî:** Nivîsandin pakkirneweya (tesfîye) hesaban e, min sêyîne ( sê roman ) nivîsand ta ez tola bavê xwe bigrim û ez ranawestim, û ta ez tême rêzgirtin (tekrîmkirin) ez diêşim, ji min re rêzgirtin ne xeme wek nivîskarek, ya girîngtir li ba min ku ez hemwelatîyek bim, girîngtir e ji ew gotina navdar " Rêza ( rûmet ) ti pêxemberekî li nav gelê wî tine ye " û ji min re ne xeme ku ez pêxemberek bim, û ji min re ne xeme bi qasî ku ji min re xeme ku ez hemwelatîyek bim, ez dixwazim ku ez jiyana hemwelatîyeke rêzdar bijîm ne ku ez rêzgirtî bim, min got " penêrî belaş tine ye ji pêvî di feqên pisikan de ", tineye ew kesê ku rêzgirtinê li te dike ji bo Xwedê, rêjîmek tineye rêzgirtinê li afirander dike bê hember, yê rêjîmê hesabên wê hene, rêzgirtinê li te dike çaxê tu mezin dibî, pêdiviya wan bi cendekên ( refat ) afiranderên xwe hene mîna ku bi Mihemed Dîb û bi hineke dî re qewimî.

**Pirs: Tu dibêji ku te biryara destberdan ji helbestê girt ji tîrsa ku tu jê nêziktir bibî, çawa te dest ji helbestê berda?.**

**Ehlem Mustexanmî:** Em gî helbestvan jidayik dibin, hinek ji me werga dimînin û yê dî xizîziya ( xiyane ) helbestê dike, min xizîziya helbestê bi rojnameyan û romanê û jiyana hevîjînî re kir, ya ku (jiyana hevîjînî) bi temamî li dijî helbestê ye û li vir gotineke helbestvan Ebdulrehman El-Ebnodî têt bîra min " *yî xizîziya helbestê carekê bike, helbest dê hetahetayê xizîziya wî bike* ".  
... **Dûmahîk Rûpel: 20**

**EHLAM MUSTEXANMÎ .. HEVPEYVÎN ... Dûmahîk:**

**Pirs: Tu çawa veguhastin xwe ji helbestê bo romanê pakane (tebrîr) dikî?**

**Ehlam Mustexanmî:** Herku ev pirs ji min tê kirin bersiva min: Çaxê em xoştiviyekî wenda dikim helbestekê em dinivîsinin û çaxê em welatekî wenda dikin romanekê em dinivîsinin, roman kilîta welatên derîgirtî ne di rûyê me de.

**Pirs: Tu ji navine destnîşankirî re dixwîn?**

**Ehlam Mustexanmî:** Her tiştekî çeleng dikeve bin destî min ez dixwînim, ta di paşkoyan de, carnan ez ji helbestvanekî wergerandî re dixwînim karîgeriyê li min dike bêtir ji helbestvanekî mezin, ya girîng çaxê tu dixwîn tu bikevî feqa (dav) peyvan.

**Pirs: Tu çawa bi sansorê re danûstandinê dikî?**

**Ehlam Mustexanmî:** ( Dikene ) ez ser dikevim ser şeytaniya sansorvanan, nivîskarî serketî dizekî pîşewer e, dizane çawa danûstandinê bi sansorvan re bike bêyî ku bikeve feqa wî, hema dizî biçûk hêsane ku bikeve torê.

**Pirs: Çaxa ji te xwestin ku tu pirtûkên xwe diyarî rojnamevanan bikî, çira te nevê (qebûl nekir)?**

**Ehlam Mustexanmî:** Ez pirtûkekê diyarî ji ti kesî re nakim ... tenê ji xwendevanan re ... pirtûka têt diyarîkirin naye xwendin, û qewimî ku ji min hat xwestin ku ez pirtûka xwe diyarî Nîzar Qebbanî bikim lê min nevê - ma ji Nîzêr bêtir hene - ew jî ji ber ku min şerm kir ku ez pirtûka xwe li ser yekî bisepînim (ferz bikim) ta bixwîne ... pirtûkine hene têt diyarîkirin û li otêlan têt hiştin, û qewimî ku min ev li kongireyekê dît, nîgaş bike çi qas ev pirtûk hatin serşorkirin? Nivîskarîne hene ta ji hev re naxwînin. Hema yî hewl dide ku pirtûka xwe diyarî te bike ta tu wê bixwînî, mebesta wî jê ku bibêje " ji te re pirtûka min, min bixwîne ez teşbîhe (mîna) te me ... min dozînewe ( iktîşaf ) bike.

\* 1- " Museqef-il erebî " hejmar ( 40 ) sal ( 2005 ).  
2-"Sunday, 11 June 2006 ".

**Hin bersiv ji yên ku Ehlam Mustexanmî ji programa " Xelîk Bil Beyt " re diyarkirî ( televizyana Elmusteql - Future ):**

- Ez jineke destevala me, min tenê kaxetek û pênuşek heye, lê weku Edonîs dibêje: " Bahoz destevala ye, lê di hemî şeran de ew biser dikeve ".

- Serkeftin destdirêjîkirin e li ser xelkê çunkî ew nûçidana ( feşel ) wan riswa dike.

- Ez destkeftên biçûk naxwazim, ziyanên mezin bi min ji wan xweştir in.

- Em pirtûkine nanivîsinin ta em jiyana xwe derbas bikin di berevaniya wan de, lê ta ku ew berevaniya me bikin, ta piştî mirina me.


- Afirender li her dilşewatekê bi pirtûkekê vedigerîne ne bi şerine.

- Ez li dijminine binamûs digeriyam, li şerine camêriyek tê de hebe.

- Min dil dişewite bi nivîskarî dijminine wî tine ne ... nîgaş bike nivîskareke dijminine wî tine ne.

- ez dixwazim ku namene şêfrekirî bighînim xwendevan .. ku wî bihêvojim ... ku wî bihêvojim ser şoreşê, ser jiyane, ser evîne, ser tiştên çeleng.

*Sêşem ( 2 - 12 - 2003 )*



**Ev jî du helbestên Ehlam Mustexanmî, yê wergerandî zimanê kurdî:**

**Jİ PIRBÛNA KU TE EZ NIVÎSANDIM**

Te ez nivîsandim  
Bi destê ku  
Çîçek dan di bihara te de  
Bi ramûsanên ku  
Tu havîna wan bûyî  
Bi pela ziwa ya ku  
Payîza te ew belav kir  
Bi berfa ku  
Berve te  
Di ser agirê wê re  
Xwas ez meşiyam

Bi kincên ku  
Li benda sozên xwe ne  
Bi sozên ku  
Li benda evîndarên xwe ne  
Bi evîndarên ku  
Çenteyên aramiyê wenda  
kirin  
Bi balafirên ku  
Ti dem tineye ji  
Derketina wan re  
Bi balafirgehên ku  
Tu elifûbeyaya dergehên wan  
bûyî  
Bi dergehên ku  
Derdikevin ba te ew hemi  
Bi bêşênîtiya cejnan te ez  
Nivîsandim  
Bi rîbanên ermixanan  
Bi bêrîkirina rexriyan jî

Gavên me re  
Bi bêrîkirina  
Bilêtên wexerê  
Bi giraniya  
Çenteyên hêviyê  
Bi kêfxweşiyên sibehên  
otêlan  
Bi berdilgiraniya şîvê li  
mala me  
Bi bêrîkirina kilîtekê  
Bi aramiya maseyekê  
Bi desttêkelgeriya  
kenepeyekê  
Bi piştrastîya şeveke ku  
Xilmaşîya narvîna me  
dipê  
Bi bihnkêşana deriyekî  
Li ser şahîya me tê girtin  
Te ez nivîsandim .. bi  
Serbirka bêdengiyê xwe  
Bi hêsrên dibarin  
Bi ser qirmîdê mala te  
de  
Bi çîçekên bendemanê  
yên  
Çilmîsîn di bîstanê  
aramiya min de  
**... Dûmahîk Rûpel: 21**



## EHLAM MUSTEXANMÎ .. HEVPEYVÎN ... Dûmahîk:

Bi bivirê gumanên te .. bi  
Dasa kumreşiya te  
Bi sinbilên ku libên wan  
Raweşiyên di talîzokên  
nakokiyên me de  
Bi pelên gulan yên  
Firiyan ji guldanên me  
Bi hariya ramûsanên ku  
Pevketinên me ji hev dikin

Bi yê te bir ..  
Bi yê te nebir  
Bi yê

Te hişt ji min re ji temenekî  
Da wî bibî  
Bi yê te bexşand ..  
Bi yê te talan kir  
Bi yê te ji bîr kir ..  
Bi yê min ji bîr nekir  
Bi yê min ji bîr kir ..  
Bi yê hîn di jibîrkirina min de

Te bi min  
Bîr tîne

Bi yê min da te û te  
Guh neda

Bi yê te da min  
Te ez kuştim

Bi yê te xwest pê kuştina min  
Ez mirim pê!

## ÊDÎ GEREKE EV DILA VEKŞE\*

Sozek stand  
Li taxekê

Bo cara yekem em wê nas  
dikin

Li dora maseyeke çarîndirêj  
rûniştin em

Bo cara yekem.  
Me çavek

Li lîsteya xwarinan xist  
Û çavek

Li lîsteya vexwarinan  
Û bêyî ku em

Çavekî li hev xînin  
Ji dêvla çayê

Me hinek

Ji jibîrkirinê wesand  
Û wek xwarineke bingehîn  
Gelek ji derewbêjiyê.

Xiste perdaya evîna xwe  
Me çîşkek ji kurtebîrkirinê  
Xiste peyvên xwe  
Me dîniya xwe  
Xiste beriyên xwe  
Û bêrîkirina xwe  
Xiste çenteyê destan yên  
xwe

Me taximê ku  
Ti bîranînê wî tineye li xwe  
kir  
Û me pêşeroj daliqand  
Ligel mantoyê xwe bi  
derbenê de  
Evîn di ber me re buhurî  
Bêyî ku me nas bike

Em axifîn di tiştên ku ji me  
re ne gerek in  
Em gelek axifîn  
Di her tiştî de  
Û di ne tiştêkî de  
Me gotûbêjî kir di siyasetê  
û wêjeyê de  
Di azadiyê û olê de .. û di  
rêjîmên erebî de  
Me li hev nekir  
Di karûbarine ji me re ne  
gerek in de

Paşê me li hev kir  
Li ser karûbarine ji me re  
ne

gerek in de  
Dema girîng bû ku em  
Li ser her tiştî li hev bikin  
Em yên ku me  
gotûbêjî nekir

Berî îroj  
Di tiştêkî de  
Roja ku evîn

Rêgeha me ya tenhaya  
hevbeş bû?

Bi tundurûyiyekê me li hev  
nekir

Bo em biçespînin ku em  
Nema rûnivîseke  
deqûbideqin ji hevdu  
Me gotûbêjî kir bi dengêkî  
bilind

Da em ser bêdengiyê  
Dilê xwe binixêmin

Yê ku hişt em  
Me gelek nihêrî li

Demjimêra xwe  
Me jibîr kir ku em

Binêrin li hevdu hinekî  
Me lêburîn pêşkêş kir

Ji ber ku me

Ji dema hevdu gelek bir  
Paşê em vegeriyên me  
Şemşaq ji hevdu re kirin  
Bi demeke serbar bo  
derewbêjiyê

Em hew man yek .. em bûn  
dudo  
Li kêleka maseyeke  
çarîndirêj  
Em li hember hev bûn  
Dema birîn zivirî  
Me rabû xwe dûr dixist ji  
maseyên çarîndirêj  
"Evîn ku dudo li kêlek hev  
bin da ku  
Li aliyekî binêrin .. ne ku  
Li hember hev bin  
Da ku li hevdu binêrin"

Tu xemên xwe  
Ji min re

Yekê li pê yekê vedibêjî  
Ez têdighim ku ez nema  
Xema te ya yekem im  
Ez ji te re  
Li ser pirojeyên xwe  
di axifim

Tu têdighe ku te  
Koç kirye ji bîrnameya min  
Tu dibêjî ku tu  
Çûye ew xwarinxaneya ku  
..

Ez ji te pirs nakim ligel kê  
Ez ji te dibêjim ku ez  
Nêzik dê rêwî bibim  
Tu ji min pirs nakî kude

Bila be ..

Evîn ne amade bû  
Li ser şîva me ya dawî  
Derewbêjî li şûna wê  
amade bû

Ew bû gersonekî  
Daxwazên me bilez tîne  
Bo em deşe cih bikin  
Bi xerabûneke kêmîr  
Wê êvarê

Danê evînê sar bû  
Wek şorbeya me

Şor bû

Wek çêja hêsira me  
Û bîranîn vexwarineke  
neşayistkirî bû  
Me fir fikir ew

Di nav gav û gavê .. bi şaşî

Gavê ku

Maseya evînê tê rakirin  
Çiqasî rûniştin li ber  
Tiştêk ji hişkêmiyê xuya  
dike

Û çiqasî evîndar  
Bêhiş xuya dikin

De ji çira man

Ji me re pire ev derewbêjî  
Maseya xwe rake evînê  
Êdî gereke ev dila vekşe

\*temenê vê deqê panzde salin

## DÎWAR ... Û AHENGA PIRSAN



**Baranê Sindî**

[barano@mail2world.com](mailto:barano@mail2world.com)

( Dêrîk - Sûriya )

Kanî geştiya rûyê te yadê?  
Kanî reştiya keziyên te  
yadê?

Kanî lorînkên te yên xem-  
revînî?

Bi kû ve çûn?

Danîn li kij warî?

Bêhna gotinên te yên  
biharî

Kî ji te mêtine...?

Dergehên bayê kovaniyê

Kî li ber te vekirne...?

Û salên te tajo ber bi gorê  
ve?

Kî tu kirî rêwenga riyên  
berf û hewarê?

Û niç niç û hey hey xistine  
ser zimanê te?

Bêje dayê kî?

Kî em dûrîkirine ji te?

Mêla me pizot xiste cergê  
te?

Û qûnaxên valehiyê

Ji te re kirine tevin?

Nav û bêhna me tenê

Li nav buxçikên te hiştin?

Bêje dayê kî....?

Kî...?

Kî....?!

**HAFIZÊ ŞÎRAZÎ, XOCEYÊ MELAYÊ CEZÎRÎ**

... Dûmahîk:



*Di vê taqê, di vê xanê me 'eys û êminî kanê  
kesî dest dit ji dewranê nihalik vê gulistanê*

*Der axûşêş çu mî ared ki ez dil canêş buspared*

(( *Ceres feryadi mî dared ki ber bendîdê mehmilha* ))

Wate: Di vê dinyê de rihetî nîne, û heta ku kesek xweşiyekê ji vê jiyane bi dest xwe dixîne û pişt re bi dildarî hembêz dike ((**zengila mirinê lédikeve û ji dinyayê bardike**))

Di heman helbestê de Cezîrî ji xwe re dibêje:

*Ji Hafiz qutbê Şîrazî, Mela! fehm er bikî razî*

*Bi awazê ney û sazî bibin ber çerxê perwazî*

Wate: Mela! Eger tu razekî ji razên Hafizê Şîrazî fêhm bikî, di rêya bilûr û tenbûrê re, tu dê bi firê bigihî ezmanan ( tu dê zû navdar bibî ). Hafizê Şîrazî kiye ta ev qasî Cezîrî ew wek mînak ji xwe re girtiye?.

**Hafizê Şîrazî** (1325?-1389?): Navê wî Muhemmed Şems Eddîn e, û navdare bi "Lisan El-Xeyb" Helbestvan û sofîyekî Farise. Li Îranê li bajarê Şîraz ê ji dayik bûye, di malek perîşan de sêwî mezinbûye, lê pir ji zanîna olî hez dikir, û weha xortanîya xwe tede derbaskirîye û Qurana pîroz ezberkirîye û xwendin daye lewra bi navê Xwacê Hafiz hatibû naskirin. Hafiz pir ji bajarê xwe hez dikir û kêman çarê jê dîrdiket. Hafiz helbestvanê şahnişîniya Şîraz, paytexta herêma Fars, li cem şah Ebû Îshaq bû. Şah Ebû Îshaq hunerperwer û xwedî zewq û dostperest bû, û ji ber ku ew û Hafiz di heman temenî de bûn dostaniyek xurt di navbera wan de çêbûbû. Hafiz di şevbuhêrkên helbestan de yên ku li bexçeyên Şîraz ê dihatin lidarxistin beşdar dibû. Hafiz bi dîwana xwe ya biçûk navdare, ku helbestên xezelê ( evîndariyê ) û hin qesîde û çargoşe tede hene. Cezîrî pir hawê helbestên xezelê kirîye. Xezela sofî li cem Farisan armançek serbixwe ye û şert û mercên wê hene, yên giring ev in: Ku xezel zimanpak be yan sembolên sofî peyda bike û girînge nebe destpêka mijarek din û her helbestek dor 7-15 malikan be, û di malika dawî de helbestvan navê xwe yê wêjeyî nîşanbide, û girînge ritma helbestê li gor stranên bête danîn, û peyvên wê levhatî û nerm û zelal bin ku dilên mirovan berî guhên wan pêre bihejin, wek mînak Hafiz dibêje:

*( Derdê işqî kişîdê em kê mepurs  
zehrê hecrî çîşîdê em kê mepurs!! )...*

*( Men bi gûşê xud ez dehanêş dûş  
suxenanî şînidê em kê mepurs!! )*

*( Sûyê men leb çî mîgezî kê megûy  
lebê le'î guzîdê em kê mepurs!! )...*

*( Hemê çû Hafizê xerîb der rehê işq  
bi meqamî reside em kê mepurs!! )*

Wate: 1)- Ji min nepirse ji ber ku min derdê evîndariyê, û jehra dûrbûnê tamkirîye. 2)- Nepirse ji ber ku min duh bi guhê xwe axavtinek (xweş) jê bihîstîye. 3)- Nepirse û tu li ber min çî lêva xwe gezdikî ji bo ez nebêjim ku min lêvek sor hilbijartîye. 4)- Nepirse ji ber ku ez di rêya evîndariyê de wek Hafizê xerîbim û ez gihîştîme cîyekî bilind!!!!!!!.

**Hafiz û bûyerên demê:**

Mexolan dest avêtibûn ser Îranê û wetên Musilmanan û pir serpehatîyên bi êş azar li ser Şîrazê derbasdibûn. Pir xwîn dihat rijandin û pir şahnişînan dihatin hilweşandin. Piştî wextek dirêj dem hat û Muhemmed Mubariz Eddîn mîrê herêma Kerman hat Şîraz dagirkir û pişt re Ebû Îshaq kuşt. Hafiz bi dilşewatî avêtibû ser dost û hevalê xwe.

Di vê rewşa xerab de durûtî û nangenimî û zexelbazî belavbûbûn. Di vir de Hafiz pir xemgîn bûbû û rojên xwe bi kul û derd derbasdikirin bêyî ku karibe tiştekî bike. Ji ber vê rewşê, reşbînîyê dabû ser dilê wî û tenê helbest bûbû bihinvedanek ji giyanê wî yê levketî re. Di helbestan de şerê sofîyên durû dikir, yên ku xwe nêzîkî desthilata nuh dikirin.. Dibêje:

*( Waizan k-în cilvê der mihrab û menber mîkunend  
çûn bi xelvet mîrevend an karê dîger mîkunend )*

*( Gûiya baver nedarend rûzîgarê daverî*

*k-în hemê qelb û dexel der karê daver mîkunend )*

*( Ya reb î nû devletan ra ba xerî xudîşan nişan*

*k-în hemê naz ez xulamê Turk ve ester mîkunend )*

Wate: 1)- Çi bi van wa'izên ku hildikişin ser menberan hatiye? Ku dema bi tena xwe dimînin tiştekî din dikin !!! 2)- Ma gelo baweriyê bi roja qiyametê naynin? Ku karê xwe tije xap û derew kirine!!! 3)- Xwedêyo! Ev dewlemendên nuh bi kerên wan re diyarbike, çawa ku niha bi xulamên Turk û bergîlan re derdikirin!!!!!!

Û bo dilnermiyê û dîrxistinê nakokîyên olî bangdikir, dibêje:

*( Cengê heftad û du millet hemê ra 'uzir binê*

*çûn heqîqet nedîdend rehê efsanê zedend )*

Wate: Behaneyê ji van heftê û du beşan re, ku ketine cengê, bibîne ji ber ku wan rastî nedîtiye û di rêya çîrokên derewîn re çûne. ... **Dûmahîk Rûpel: 23**

**HAFIZÊ ŞIRAZÎ, XOCEYÊ MELAYÊ CEZÎRÎ ... Dûmahîk:**

Hafiz helbestvanê du aliyân:

Li alîkî, Hafiz di xezelên xwe de pir li ser mey û meyxuran, evînê û pêrgînê diaxive, ev hiştiye ku hin wêjevan bawerbikin ku Hafiz rê û rêbaza 'Umerê Xeyyam dişopîne. Û li alî din jî, Hafiz mijarek din tev li helbestên meyê kiriye, ew jî sembol û zaravên sofitîyê ne, ev jî dihêle hin wêjevan Hafiz wek helbestvanekî oldar û xwedî rêbazek sofî bibînin.



Bi rastî, gotinek bêguman li ser vê mijarê ne hêsane. Dibe ku Hafiz di destpêka helbesta xezelê de bavêje dinyê û xelkên wê yên durû û ji nişka ve meyê pêşkêşî me dike da ku em li ber pût (yar) vexun. Lê ew di hin helbestan de mebesta xwe ji meyê diyar dike ku ew meya buhuştê ye ya ku guneh di vexwarina wê de nîne, dibêje:

( *Mestî bi abê yêk du îneb vezi-ê bendê nîst  
ki men salxurdê pîrê xerabat perverem* )

**Wate:** Serxweşîya ji ava tirî ne karê feqîrê wek mine, ji ber ku ez li ser destê şêxekî kal perwerde bûme.

( *Hizûrî ger mî xahî ez û xayib meşû Hafiz  
meta ma telqe men tehwa dei edunya ve ehmilha* )

**Wate:** Hafiz ! Eger tu dixwazî amade bî û nêzik wî (Xwedê) bî dûr nekev, û dema tu evîndarê xwe bibînî dinyayê ji dest xwe bavêj.

**Çanda Hafiz:**

Xuyaye di wan deman de Hafiz xwedî çandek bilind bû ji ber ku Quran ezberkiribû û di zimanê Erebi de baş xurt bû, û hay ji wêjeya wê hebû. Berhemên helbestvanên berî xwe xwendibûn jî. Ji ber weha karibû şeweyekî cuda peydabike, ew yê ku têde du aliyên ji hev dûr bi rengekî balkêş danîne ber hev û li hev anîne. Û di vî warî de qedrê xwe xweşik nasdikir, pirê caran pesnê helbestên xwe dida, dibêje:

( *Nedîdem xoşter ez şî'rê tu Hafiz!* )

Bi Quranî ki tû der sîne darî )

**Wate:** Hafiz! ez bi Qurana ku di sînga te de ye sond dixum, ku min helbest ji yê te xweştir nedîtine.

Hafiz di dema zêrîn ya wêjeya Farisî de jiyaye, dema Se'dî û Camî. Û bandora wî li ser milletê Îranê bi rengekî xurt çêbûye, ku malek nîne ku dîwana wî lê nebe, û kêman caran kesin peyda dibin ku malikekê ji helbestên wî nizanibin. Bêtirî vê jî, Hafiz li cem sofîyan, çêtirîn kese ku zewq û dilgermiya wan aniye ziman. Lê belê hin dinerin ku ew yek ji alîgirên rêçika Xeyyame.

*Jêder:*

- *Dîwana Melayê Cezîrî - Encarta 2007 - Dîwana Hafiz - کلید زبان فارسی*

**SUBHÊ 'ÎDIL-MUIMINÎN E\***

Şermola - Amûda

**Mele 'Ebdil-Mecîd Ibrahîm Ken'anî**

( *???? - 1939* )

( *Amûda - Sûriya* )

Subhu 'îdil-mûminîn tev bû li min şîn û girîn  
gulperestan gul hilanîn mame bê gul dil hezîn

Bulbulê mecrûhê 'îşqê dûr ji gulzarê cemal  
der gulistana xwe bê gul ma bi nalîn û enîn

Şem'ê ber perwaneyan murxê seher ba-ê nesîm  
tawusan xemlê xwe danîn bûne mecrûhê evîn

Qumrîyan qumqum ji ezber çû ji nalîn kebkebek  
'endelîban per şikestin nûkirin derd û birîn

Subhê 'îde dê biçin se'î û tewafa Ke'be-ê  
hacîyan destê du'a-ê rakirin rebbê metîn

Aşiqan me'sûq hilanîn hev bi sehrayan birin  
ew di westlê pir li ser firqa xwe kalîn û girîn

Şem'ê perwane bi lewma kir digo 'aşiq nehî  
lew dema ez te disojim qet di te agir nehîn

Gotê perwane : Eya miskîn nizanî bê mefer  
ferqê nakî ku heyata te bi narê min yeqîn

Subhê 'îde agirê dil zêde bû sotî ceger  
ez firaqê yarê şîrîn dilnewaz û nazenîn

Dilke-îb im ez di 'îdan her dema min tene bîr  
xal û xettê qumrîyan hem qedd û balayê şîrîn

Kuştine deh sed wekî Ken'anîyan dil parepar  
guft û goyê nazenîna 'aşiqê dilber-hebîn

\* *Jêder: Ji danhevên 'Ebdil-Rehmanê Kurimî ( 'Evdî )*



## (3) KLASÎKO YÊN SPANIYA



### KLASÎKOYÊ LÎGA SPANIYA

RIYAL MADRÎD (1) × BARŞALONA (1)

Di roja Şemîya (16-4-2011) an de, klasîko yê lîga Spanî yê duyem di navbera Tîma Riyal Madrîd û Barşalona li stada Santiyago Bernabîyo bê serkeftin û bi golek li hemberî golekê derbasbû.

Gola Barşelona ji aliyê lîstikvan Liyonêl Mêsî de bû, û ya Riyal Madrîd jî ji aliyê lîstikvan Kiristiyano Ronaldo de bû. Encam wek berê bi (8) xalan Barşalona di pêş Riyal Madrîd de ma.



### KLASÎKOYÊ CUPA ŞAHÊ SPANIYA

RIYAL MADRÎD (1) × BARŞALONA (0)



Di roja Çarşema (20-4-2011) an de, klasîko yê Cupa Şahê Spaniya yê di navbera Tîma Riyal Madrîd û Barşalona de, bi goleke ji seriyê Kiristiyano Ronaldo; Riyal ji Barşalona vexwar û Cupa Şahê Spaniya bidestxist. Hêjayî gotinê ye ku ev cupa 18mîne ku Riyal di dîroka xwe de bidestdixê û ji sala (1994) an de hîn ranekirîye, lê hema Barşelona 25 caran qezenkiriye.



### KLASÎKOYÊ CHAMPIONS LEAGUE

RIYAL MADRÎD (0) × BARŞALONA (2)

Di roja Çarşema (27-4-2011) an de, Tîma Barşalona bi (2) golan di klasîko yê Spaniya yê di Champions League de ji Tîma Riyal Madrîd li stada Santiyago Bernabîyo vexwar.

Herdu golên Barşelona di matçê çûnê de ji aliyê lîstikvanê Arcentînî Liyonêl Mêsî de bûn, golê yekem di deqeya (75) an de û yê duyem û herî bedew di deqeya (87) an de bû.



## FIFA - SPANIYA YEKEMÎNE DI CÎHANÊ DE



Di nîrxandina FIFA ya mehane de, ya ku di roja Çarşemê (13-4-2011) an de derket, dîsa welatê Spaiya; lehengê world cupa cîhanê di sala (2010) an û yê Ewropa di sala (2008) an de; di warê futbolê de wek yekemîn welat ji aliyê FIFA de hate nîrxandin. Her weha welatê Holenda di rêza duyemîn û Berzîl jî hilkişiya rêza sêyemîn û welatê Almaniya çaremîn û Arcentîn pêncemîn û Ingiltera şeşemîn û Uguwê heftemîn û Purtugal heştemîn û Italiya nehemîn û Kurwatiya dehemîn hatin nîrxandin.



## KLASÎKO YÊ ITALIYA

MÎLAN (3) × ENTER (0)

Di roja Şemîya (2-4-2011) an de, klasîko yê lîga Italî yê di navbera Tîma Mîlan û Enter de li bajarê Mîlano, bi sê golan Tîma Mîlan ji Enter vexwar.

Du golên Tîma Mîlan ji aliyê lîstikvanê Berzîlî Iliksender Pato de bûn, û yek jî ji aliyê lîstikvan Intoniyo Kasano de bû.

Di encamê de, tevahiya xalên Tîma Mîlan bûn (65) û bi (5) xalan kete pêş Tîma Enter yê ku ta qonaxa (31) an (60) xal qezenkiriye.

Hêjayî gotinê ye, ku Tîma Enter di hinderê sala borî de (5) cupa û lehengî qezenkiri bûn; Lîga Italî û Cupa Italiya û Lehengiya Champions League û Cupa Tîmên Cîhanê û Super ya Italiya.



## CHAMPIONS LEAGUE

ŞALKE (0) × MANŞÎSTER YÛNAYTÊD (2)

Di roja Sêşema (26-4-2011) an de, Tîma Manşîster Yûnaytêd yê Inglîzî bi (2) golan di Champions League de ji Tîma Şalke yê Almanî vexwar.

Golê Tîma Manşîster Yûnaytêd yê yekem di matçê çûnê de û li ser xaka Şalke ji aliyê lîstikvan Cîciz de û di deqeya (67) an de bû, golê duyem jî tenê piştî (3) deqeyan ji aliyê lîstikvanê Inglîzî Wayin Ronî de û di deqeya (70) î de bû.

